

Kurd peyama

Rojnameya Giştî ya Hefteyî
Kurdish weekly newspaper

Hejmar 20 / Sal 1

21.01.2005

Kurdische Wochenzeitung

Filma kirdkî kanalî
televîzyonî Almanya
ZDF de vêcîyay



Rûpel 16

Cemal Batûn
Demokrasî û Kurdistan -
bi hevûdu ve girêdayî ne
Rûpel 10

Yusuf Yeşilöz
Mixabin edebiyata Kurdî
hîn xwendevanên xwe
negirtiye Rûpel 9

S. Unus &
Berivan-Isabella Unus
Linguicide û
linguistic suicide Rûpel 14

Mîrê dengbêjên Kurd:
Karapêtê Xaço ji nav me
barkir Rûpel 15

Ahmet Zeki Okçuoğlu
Kerkük Rûpel 2

Li Kurdistanê yekemîn
otoban Rûpel 8

Li Îranê zextên li ser
Kurdan zêdetir dibin
Rûpel 8

Mesûd Barzanî

Em amade
ne hemû
destketiyan
fedayê
Kerkûkê
bikin



Rûpel 2

Dengdan erka hemwelatîbûnê ye!


Hêzên Kurdistanê ji bo
hilbijartina herdu Parlamenan ji
(ya Hewlêrê û ya Bexdayê) lis-
teyên hevbeş amade kirin. Ew
bangewazî hemwelatiyan dîkin ku
ji bo Meclîsa merkezi ya Bexdayê
dengê xwe bidin Listeya Yekgirtî
ya Kurdistanê, Listeya nimro 130.

Roja 30ê vê mehê li Irakê û li başûrê
Kurdistanê hilbijartin çêdibin.

Deverên Ereban wê ji bo Meclîsa Iraqê,
li Bexdayê û ji bo birêvebiriya wilay-
etên xwe deng bidin.

Li Kurdistanê, li Hewlêrê, Silêmaniyyê û
Dihokê hemwelatiyên Kurdistanê wê sê
caran deng bidin. Yek ji bo Meclîsa na-
vendî ya Bexdayê, yek ji bo Encûmena
Netewî ya Kurdistanê li Hewlêrê û yek
jî ji bo birêvebiriya bajarê xwe (Hewlêr,
Silêmanî û Dihok).

Kerkük, Xaneqîn, Mexmûr, şêxan û
şengal, ev deverên ku nû rizgar bûne,
wê wek deverên Ereban tenê du den-
gan bidin.



Elî Qazî

Di dîroka
Kurdistanê de
Komarek
bi navê
„Komara
Mehabad“
çênebûye
Rûpel 5



Baran Hemze
Divê bi
qasî hêza
dijminên
Milletê
Kurdistanê
yekîtiya
me jî bi
hêz be



Rûpel 6

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



Nasrettin Akyol

Komara Demok-
ratîk a federal

Rûpel 4

Hêvîdar Zana

Roj neçû ava -1-

Rûpel 8

Xalid Sîno

Pirsa Kurdî
li Suriyê ...


Rûpel 7

Emîn Coşkun

Polîtîkaya Kurdan
pê destî Kurdan
kişîş

Rûpel 17

Hilbijartinê li Iraqê û Başurê Kurdistanê, di riya demokratizekirina Rojhilata navîn de destpêkek dîrokî ye



Bayram Ayaz

Hilbijartinê azad, stûnek bingehîn yê demokrasiyê ye. Hebûna mafê hilbijartinê û xwedan hilbijîrinê, nişana demokratbûn û ne demokratbûna rejimekî ye. Di civak û rejîmek demokrat de pêwist e di her astî de siyasetvan û kesen birêvebir bi hilbijartinê azad werin diyarkirin.

Di vê çarçoveyê de li Rojhilata navîn demokrasiyek rasteqîn tune.

Li gor pîvanê demokrasiya rojavayî û hemdemî, belkû mirov bikare hilbijartinê li Israîlê, wek hilbijartinê azad û demokrat bi nav bike. Li Israîlê bi xwe jî, teror, şovenizm û nêrînên olî fanatik bandorek xerab li ser demokrasiyê dîkin.

Li Tirkîyê û Misirê jî dezgehîn „demokrat“ şiklî hene û helbet li van deran jî hilbijartın çêdibin. Bi taybetî hilbijartinê Tirkîyê, ji yên Misirê hinekî pêşvetir in. Li van herdu welatan bandlera peywendiyê rojavayîyan hinekî çêbûye. Lî li Tirkîyê û Misirê jî kontrol bi giranî di destê leşkeriyê de ye û zihniyeta militarizmê di civakê û siyasetê de xurt e. Vêca rejîmîn ku militârîzmî lê dominant be, demokrasi li wê derê qels e. Em dikarin Tirkîyê û Misirê, dewlet û rejîmîn ku bi modernîzmê û demokrasiyê re hinekî nasîna wan çêbûye binavbikin.

Li dewletîn monarşî yên Ereb û li dewleta İslâmî Iranê demokrasi tune û hilbijartinê li van welatan çêdibin, xapandin û leyiztok e. Hilbijartinê baasiyan tew divê mirov qet behsê neke.

Em Kurd û Kurdistanî, ji xwe dem û dezgehîn me nînin. Heta nuha dewletek me tunebû û me nekariye civaka xwe bixwe idare bikin. Em bindestê xelkê bûn. Hêj li Tirkîyê, Iranê û Suriyê rewşa me ew rewş e, koletî ye. Li van welatan hêj qedexe ye em partiyek bi navê xelkê xwe (Kurd) û welatê xwe (Kurdistan) damezirinîn!

Tenê ev sêzdeh sal in ku ronahiyeji me re li başurê welatê me peyda bûye, dewletek me de facto ava bûye. Helbet me jî hêj bingehî demokrasiyek modern û hemdemî bi temamî nekariye daynin.

Me sala 1992an dest pê kir, lê mixabin ew şerê diltezin yê navxweyi wê prosesê di nîvî de birî. Lî em Kurd û Kurdistanî, tevger û serkidayetiya me dilxwazî demokrasiyê, civaka sivil û modernîzmê ye. Me ev daxwaz û irade heye.

Di vê çarçoveyê de, em Kurd li Rojhilata navîn ne berpirsiyare anti-demokratizmê ne, berevajî em mexdûrê vê rewşê ne. Ji bo vê yekê li Rojhilata navîn herî zêde, em Kurd hewcîyê demokrasiyê ne û em ji bo vê yekê jî têdikoşin.

Tunebûna demokrasiyê li Rojhilata navîn, li pêşîya mirovayetiye astengiyek mezin e. Strûktûrîne demokrat li van deveran iro xizmeta olperestiya fanatik dîkin. Olperestiya fanatik, kîjan dîn dibe bila bibe, kevnepereстиyek erîşker û xerabker e. Berî herkesi divê kesen xwedî baweriya İslâmî, bi vê pîrsê mijûl bin û nehîlin kû musilmanî di destê Bin Laden, Zerqawî û Talibani, Cihad, Hamas û Hîzbûllahan de bimîne. Ger ev hêz xurt bibin û bi serkevin, dê demokrasi û medeniyet bi binbikeve.

Bi vê baweriyyê, dibêjîm, hilbijartinê li Iraqê û başurê Kurdistanî, ji bo bîcîhîkirina demokrasiyê û civakek sivil li Rojhilata navîn destpêkek e. Helbet her destpêk gelek kurt û kêmasyîn xwe heye. Hilbijartîna roja 30ê vê mehê bi taybetî li Iraqê, béguman dê ne hilbijartîne azad û demokrat be. Kevnebaasî û hêzîn fanatik yên din ji bo ku ev hilbijartîn serkevtî nebin her tiştî dîkin; teror, xwînrijandin û kuştîn gîhândîne derecyekek bilind. Ji xwe heta civaka Ereb hînê rê û rîçen demokrasiyê bibe jê re hêj gelek kar û dem dixwaze. Lî destpêkek bi kêmasyîn ji bo demokrasiyê, ji nêt û armancê fanatik û kevneperestan çêtir e.

Piştî lihevhatina serokatiya Kurdistanê ya li ser pirsa Kerkükê, em dikarin bi dilekî rehet bêjin ku hilbijartîn dê demokrasiyê, tevger û dewleta Kurdistanê xurt bike. Divê xuşk û birayêne me dengê xwe bidin, demokrasiyê û destê serkidayetiya Kurdistanê xurt bikin.

peyama Ji **Kurd**

Bila çav û guhêñ we li ser rojnameya we be !

Xwendevanê berketî û hêja,

Heftenameya we giha hejmara bîstan û temenê wê ji bû pênc mehi. Bi vê hejmara ve, li ser hev 480 rûpelîn rojnameyê temam bûn. Eger Peyama Kurd di mezinahiya pirtûkek (16 cm x 23,5 cm) de bihata weşandin, nuha dê pirtûkek 1406 rûpelî di destê we de bûya. Dema mirov heftenameyê yek bi yek digre destê xwe ev encam li ber çavê mirrov ne xuyaye. Lî ku tu hesab dîki, ev encama dilşad derdikeve holê. Ev yek, xêr û bêra keda nivîskar û xebatkarê rojnamê ye. Helbet para we xwendevanî ji tê de heye. Dilxwesi û nêzikahiya ku hûn ji bo rojnameya xwe nişan didin, hêzeke mezin e ji bo xebatkarê rojnameyê û nivîskaran. Em spas dîkin.

Bi kurtî, divê mirov karê weşan û çapemeniya kurdi wisa binirxîne: Her xêzek bi zimanê kurdi bê nivîsin û çapkirin xezîneya çanda Kurd dewlemeden dîke û derbekê li hewldanen astîmîlekirinê (tunekirina zîmîn) dide. Nivîskar û rojnameyan hêja Mustafa Aydogan, derketina Peyama Kurd wisa bi nav kiribû: „Em bi hewara zimanê kurdi ve tê!“. Belê, ji bo bakurê welatê me ev navlêkirinek rast e. Em bi nêrîn û ruheki Kurdevari û Kurdistanperwerî, bi hewara zimanê xwe ve hatine û ji bo xizmeta Kurdiya şîrîn iro em li meydanê ne. Em bi keyfxwesi dîbinin ku her kesê destê xwe dirêjî me dîke, tevlî vî kari dîbe, ew ji bi vî ruhî tê. Hûn hemî bi xêr û xweşî hatin. Yen hêj nehatine çavê me li benda we ye. Em bawer in, di nêzik de, dê hinek nivîskar û rojnameyan hêjayê din jî tevlî

karwanê Peyama Kurd bibin û bi nîvis û nêrînên xwe me şâ bikin.

Di hejmaren pêş de, em dixwazin di derheqê heftenameyê de dest bi lépirsînekê bikin. Emê ji rojnameyanen Kurd yê profesyonel tîkayê bikin ku nêrîn û pêşniyariyê xwe, ci di warê tekniki û ci jî di warê na-verokê de, di derbarê Peyama Kurd de ji me re rîbikin. Bi rastî carna em bi vê yekê dihesin, dibêjin xwezi hin nirxandinê wisa bigîhana û me wan biweşanda. Helbet em dizanîn Kurd û Kurdistanîyê welatperwer bi derketina heftenameyeke xurû Kurdi gelek dilşa ne, lê ji bo nûjenkirin û xurtkirina rojnameyê em hewceyî pêşniyariyê we ne.

Xwendevanê hêja, weki hûn dibînin, heta ji destê me tê, em dixwazin rojnameyan hertim di dema wê de biweşînin û bigînin destê we. Hejmaren 16 û 17 ya rojnameya we ketin ber du tatîlîn giring li Ewrûpa, anglo roja bûyîna Isa Pêxember û roja ser-salê. Digel ku me dizanî dê di belavkirin de hin astengî çêbibin jî, me karê xwe domand û rojnameyê rojek berê xelas kir. Lî hin agahdarî gîhan me ku rojname negihaye hin deveran. Di belavkirin û sistema abonetiyê de hin kemasî çêdibin. Ev pirs, belkî bikarin çareser bibin, eger hin hewildanen me ji bo dîtina sistemeke nû ya belavkirin bi serkevin. Em bi vî karî ve mijûl in.

Hûn bîmînin di nav xweşiyê de û heta hejmara bîst û pêncan bi xatirê we ... (B.Ayaz)

Cejna Qurbanê pîroz be



Em Cejna Qurbanê li tevayê misilmanan û bi taybetî li kurdên misilman pîroz dîkin. Her wiha, em şehîden Hewlîrê yên ku par di Cejna Qurbanê de, jiyanâ xwe winda kirin bi rîz bi bîr tînin. Em di vê cejnê de ji her demê bêtir bi hêvî ne ku gelê kurd wê nêziktirin cejna xwe li Kurdistanâ mezin pîroz bike.

IMPRESSUM

XWEŞİYE ROJNAMEYE
PEYAMA KURD VERLAG
PEYAMA KURD
THOMAS-MÄNN-STR. 22, 53111 BONN / GERMANY
FON: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
FAX: +49 (0228) 18 00 656
WWW.PEYAMA-KURD.COM
INFO@PEYAMA-KURD.COM

REDAKSİYON

KURMANCIYA JORİN:
FADIL ÖZCELIK (EDITORÉ BAKUR, FC)
SIRWAN HEÇI BERKO (EDITORÉ ROJAVA û DIASPOR, SH)
SILEMAN ALİKANI (SA), Z. PIRKEMAL (MAGAZIN Û BEHÎVEDAN 27)

KIRDİK (ZAZAKI):

SEYÎDXAN KURU (EDITOR, SK)

KURMANCIYA JERİN:

DANA ALI, VENUS FARQ, SIMKAN AZIZ,
NIZAR ÇAF, COTYAR DARFIROS, MANSUR SIDDIQ,
MUSTAFA CHIARTAY

PEYAMA KURD JI MAFÊ XWE DIBINE, KU NIYISEN JE BI TEHE
SANDIN, KURT BIKE. EWEJI ALIVE REZİMAN Û RASTIRVİSNE
VE DI SERASKIRINA BERHEMAN DE AZAD E. PEYAMA KURD
BERHEMAN KU JE RE TE SANDIN Û BERÊ LI CIYEN DIN HATDE
BELAVKIRIN, HAWESNE

Dengdan erka hemwelatîbûnê ye!

Hêzên Kurdistanî programek politiki ji 26 xalan amade kirine û armancê xwe diyar dikan. Dirûşma Kurdistanîyan Irakekî demokrat, federe û yekgirtî ye. Hêzên Kurdistanî stûna hilbijartinê û tevgera demokrat in.

Ji bo Parlamenta Netewî ya Kurdistanê ji listeyek hevbeş hatiye amade kirin û wê 111 Parlament ji bo çar salan bêñ hilbijartin. Ji sedî bîst û pênc namzatan jin in. Nûneren Aşûrî, Keldanî û Turkmenan jî di listeyê de cih digrin.

Mixabin, xelkê van deran ku jimara wan bi qasî milyon û nîvekê heye wê tevlî hilbijartina Parlamenta Netewiya Kurdistanê nebin, ji ber ku ev never hêj bi Kurdistanê ve nehatine girêdan. Ev yek helbet kêşeyek girîng e, birînek e ku hêj derman nebûye.

Daxwaza bizava Kurdistanê ya sereke ew bû ku ev herêm di zutirîn demê de bi idareya Kurdistanê ve bêñ girêdan. Daxwaza gelê Kurd jî û daxwaza Turkmen, Aşûrî û Kildaniyê Kurdistanî yên van neveran jî bi piranî ev bû. Gel dixwaze bi idareya Kurdistanê ve bêñ girêdan. Ji xwe di jiyanâ rojane de ev never bi dezgehê Kurdistanê ve girêdayî ne. Lî heta nuha ne pirsa Kerkûkê û ne jî ya neveren din hêj bi temamî çareser nebûye. Kerkûk jî tê de ev never hemi perçeyek ji Kurdistanê ye. Bi dîrokî û bi serjimara xwe ew dikevin nav coxrafya Kurdistanê. Bi lihevhatinê vê dawiyê bizava Kurd vê yekê bi Ereban û hêzên hevpeyman jî da pejirandin. Lî, mixabin di vê hilbijartinê de, wê hemwelatiyê van neveran pişkarê iradeya politiki ya Kurdistanê nebin.

Çavdîrên politik destnîsan dikan ku kîmasiya herî mezin a hilbijartina Parlamenta Netewî ya Kurdistanê ev noqte ye, ku perçeyek ji gelê Kurdistanê nikare dengê xwe bide û idareya xwe hilbijêre û hêj perçeyek ji axa Iraqê tê pejirandin.

Digel gelek kurt, kîmasî û aloziyê hene, hilbijartinê li Irakê û li Kurdistanê wek gavek dîrokî têñ nirxandin. Ev hilbijartin ji bo danîna rejimeke demokrat destpêk e.

Hêzên fanatik-olperest û kevnebaasî ji bo ku hilbijartin bi sernekevin hemi tiştî dikan. Ji ber ku eger demokrasî xurt be, ewê hêza xwe wenda bikin. Dewletêñ dorber jî ji bo ku li Irakê emîn, aramî û iştîqrar pêkneyê, her desttîwerdanê dikan. Ew jî Irakekî demokrat û federal ji bo xwe metirsîyek dinirxînin. Li gor awirêni siyasetvanêni ji heremê û biyanî, faktora herî mezin jî doza Kurd û Kurdistanê ye. Eger li Rojhilata Navîn demokrasî xurt bibe, wê doza rewa ya Kurdan jî çareser bibe û ev hêz vê yekê naxwazin.

Ji bo vê yekê Tevgera Kurd li başurê welêt bangî hemi Kurdistanîyan, hemi hemwelatiyê Irakî dike ku li Kurdistanê, li Irakê û li derveyê welêt tevli hilbijartinê bibin û dengê xwe bidin.

Hêzên Kurdistanê ji bo hilbijartina herdu Parlamentan jî (ya Hewlêrê û ya Bexdayê) listeyen hevbeş amade kirin. Ew bangewazî hemwelatiyân dikan ku ji bo Meclisa merkezî ya Bexdayê dengê xwe bidin Listeya Yekgirtî ya Kurdistanê,

LISTEYA NUMRO 130.

Ji bo Meclisa Merkezî ya Bexdayê wê 275 Parlament bêñ hilbijartin. Listeya Kurdistanê 165 kandidat nîşan dane. Nûneren û serkêşî Listeya hevbeş ya Kurdistanîyan Sekreterê YNK Celal Talabanî ye. Di listeya Kurdistanê de ji sedî 33 namzatan jin in. Di Listeyê de hemi hemwelatiyê Kurdistanê cih digrin: Kurd, Aşûrî, Keldanî, Turkmen, Ereb... Hêzên Kurdistanî programek politiki ji 26 xalan amade kirine û armancê xwe diyar dikan. Dirûşma Kurdistanîyan Irakekî demokrat, federe û yekgirtî ye. Hêzên Kurdistanî stûna hilbijartinê û tevgera demokrat in.

Ji bo Parlamenta Netewî ya Kurdistanê ji listeyek hevbeş hatiye amade kirin û wê 111 Parlament ji bo çar salan bêñ hilbijartin. Ji sedî bîst û pênc namzatan jin in. Nûneren Aşûrî, Keldanî û Turkmenan jî di listeyê de cih digrin.

Ji bo meclisîn bajaran her yek wê 41 kes bêñ hilbijartin. Ev hilbijartin wê di dîroka Irakê de hilbijartinê azad yekemîn bin. Li Kurdistanê sala 1992 an hilbijartinê azad û demokrat çêbûbû.

Hemî parti û hêz bangî hemwelatiyân dikan ku tevli hilbijartinan bibin û demgê xwe bidin listeyen hevbeş.

Kerkûk



Ahmet Zeki Okçuoğlu

Kerkûk ne bi tenê bajareki Kurdistanê ye, ew qedera Kurdistanê ye jî. Bi gotineke din, qedera Kurdistanê bi Kerkûkê ve girêdayî ye. Buhayê Kerkûkê wekî ku herkes jî pê dizane ji petrolê tê. Kurd, sed sal e ku ji rûyê petrola Kerkûkê zilmê dikşînin. İro jî astengiyê li beramberî dewletbûna Kurdan li Başûr, tev ji rûyê Kerkûkê ye. Ji rûyê petrolê Kerkûkê, dijminê Kurdan nehiştin Kurd bibin dewlet. İro jî disa ji ber wê yekê nahêlin Kurd bibin dewlet.

İngiliz û Tirk li Lozanê, (1923) ji bo ku herêma petrolê ji Kurdistanê qut bikin, başûrê Kurdistanê ji Kurdistanê qetandin û xistin bin desthilatdariya ereban. Niha jî ji ber eynî sedemê dixwazin careke din herêma petrolê (Kerkûk) ji başûrê Kurdistanê, ji Kurdistan qut bikin û bixin bin desthilatdariya Ereban.

Her bostek axa Kurdistanê ji bo me pîroz e. Lî Kerkûk ji bo Kurdan tiştekî dinê ye. Bêyi Kerkûkê tu qîmeteke Kurdistanê tune ye.

Kerkûk paradoksek e; heyâniha bû sedema nedewletbûn û dagirkirina Kurdistanê. Dewletbûna Kurdistanê ji disa ancax bi saya Kerkûkê mimkûn e. Bêyi Kerkûkê dewletbûna Kurdistanê ne mimkûn e. Mimkûn be jî tu buhayê wê dewletê nîne.

Diviya hêz û partiyen Kurdan di roja ketina Seddam Husênde beriya Bexdayê biçûna li Kerkûkê bi cih bibûna. Xeletî kirin neçûn li Kerkûkê bi cih nebûn. Rojek pêş de divê vê xeletiyê telafî bikin û herin li Kerkûk bi cih bibin.

Ev çiqasî dirêj bibe, planêñ dijminê Kurdan ewqasî xurt dibin. Heger pirsgirêka Kerkûkê di vê aloziya Iraqê de çareser nebe, tu caran çareser nabe.

Mesûd Barzanî: „Em amade ne hemû destketiyan fedayê Kerkûkê bikin“

Serokê PDK Mesûd Barzanî di 16ê mehê de di parlamento Kurdistanê de axaftinek kir û di derbarê mijara Kerkûkê de peyamîn girîng gîhan raya giştî ya Kurdan û ya dînyê. Barzanî got ku wan ji Emerikayê re jî ragihandiye ku di mijara Kerkûkê de hesabê encamê ango feyde û zirar nayê kirin. Barzanî ragihand ku eger di vê mijarê de li-hevkirin nebûya û bi emerikayîan re têketina ser jî qebûl nedikirin ku Kerkûk ji destê kurdan derkeve. Herwiha Barzanî eşkere kir ku çareya niha hatiye dîtin çareyek lihevkirinê ye û bîryarek li ser pêşeroja Kerkûkê nehatiye dayin û berdewam kir, madem ku daxwazên me yên demî hatine qebûl kirin çêtir e ku kurd besdarî hilbijartinan bibin.

Hemû deskeftiyan fedayê Kerkûkê bikin

Barzanî di axaftina xwe de bi bîranî ku eger hîkûmeta Iraqê li ser gotina xwe nemîne û poşman bibe ew amade ku her tiştî ji bo Kerkûkê bikin. Barzanî di axaftina xwe de behsa tirkmenan jî kir û

ragihand ku piraniya tirkmenan mafêñ xwe dizanîn lê anî ser zimêni ki hinek ji wan ne ji bo mafêñ tirkmenan dixe-bitin. Herwiha Barzanî soz da ku wê ji bo parastina mafêñ tirkmenan û hemû kîmneteweyê mayin li Kurdistanê hewl bide û bi berdewamî got: „Ji bo xelkê Kerkûkê û ji bo gelê kurd dibêjim ku bi tu terzan bazarê li ser Kurdistaniyeta Kerkûkê nakin û qebûl nakin. Kerkûk dê bibe bajareki birayeti û tevde jiyanê. Kerkûk bajareki Kurdistanê ye ku kurd, ereb, tirkmen, aşûrî û kildanî tê de dijin lê di hemû şoreşen miletê kurd de pirsgirêka esasi problema Kerkûkê bû.“ Barzanî bi bîranî ku dî şoreşa şêx Mehîmûdê Berzencî de niqteya nakokiyê Kerkûk bû, di şoreşa Barzanî de sedemê şerê 1974an jî Kerkûk bû. Barzanî bi awayekî vekirî careke din jî eşkere kir ku kurd amade ne ku hemû destketiyan fêdeyi Kerkûkê bikin.

Ziyareta heyeta Kurdan li Bexda ye Heyeta Kurdan ya bi serokatiya sekreterê giştî yê YNK Celal Talabanî û

Nêçîrvan Barzanî ku ji bo statu û hilbijartinê Kerkûkê çûbû Bexdayê di 15ê mehê de di derbara ziyareta xwe li parlamento Kurdistanê agahdarî da. Li gora agahdariya heyetê hîkûmeta Iraqê, ambasadora Emerikayê û ya Britanyayê binecîhkirina xala 58an dikan û qebûl dikan ku kurdên vegerine Kerkûkê dengê xwe bidin.

Richard Boucher: Kerkûk pirsek Iraqê ya hundurîn e

Berdevkê wezareta derive ya Emerikayê Richard Boucher bi daxuyaniyea nivîskî ragihand ku Emerîka piştgiriya bicihanîna xala 58an dike û got ku pirsa Kerkûkê pirsek Iraqê ya hundurîn e. Li gora xala 58an Kurden ku bi zora Seddam ji Kerkûkê hatine bidûrxistin divê vegerin mala xwe û erebênu ku hatine li malen wan bi cih bûne divê malen kurdan terk bikin.

Têbiniyek!

Dara Bilek



E ve demeke rewşa tevgera Kurd li Bakurê Kurdistanê bi germî tê minaqeşekirin. Dixweyê tevgera Kurd di nava lêgerinekê de ye. Ji aliyeji ve partiyêni siyasi ji bo rewşa xwe baştır bikin kar dikan ji aliyeji din ve gelek kesayetêni siyasi ji derê partiyêni heyin di nava letekê de ne. Gelek civin tê çekirin ji bo platform û partiyêni nû bêne avakirin, gelek kesayetêni siyasi çalakiyên cur bi cur dikan. Piraniya van çalakiyan ji bo avakirina partiyêni eşkerene. Bê goman her xebatek xwedî nirxekêye û gerek tu xebat li dijî hevûdin neyê nirxandin. Ez bawer dikan ku piraniya karen tê kîrin hevûdin bi awayeki temam dikan.

Lê cardin mirov dibîne ku hinek minaqeşeyen ne di cih de têne kîrin. Wek "legalite" û "ilegalite". Di vê konaxê de, eger mecal hebe ku li Kurdistana Bakur, hinek partiyêni Kurd bi awayek destûri bêne damezirandin ev tişteki erêni ye. Lê eger di vî warî de dijitiya partiyêni ku ne eşkerene bête kîrin û bê gotin ku "Hêdi dem ne dema partiyêni xefin û gerek herkes di partiyêni eşkere de cih bistîne" ev çewtiyek mezin e. Ji ber ku her pêvajoyek taybetmendiyêni xwe hene. Tu caran rëexistinêni Kurdistani ne bi keyfa xwe bûne partiyêni

veşarti. Zilm û zordariya dijiminan ew mecbûr kîrine. Eger bi navê eşkerebûnem dijitiya hev û din bikin, yan ji navê "legalite û ilegalite" dijiminatiya hev bikin wê tevgera Kurd zererê ji vê yekê bibîne.

Bê goman li Kurdistana Bakur li ser cureyê xebatê û cureyê avakirina partiyêni nû mirov dikare pirali guftugoyan bike. Lê eger herkes berjewendiyêni xwe yên kesayetî yan ji yên rëexistinî derxin pêş û li gora vê rewşa heyî binixîne wê çewtiyêni mezin bêne kîrin.

Eger em guftugoyan di çerçeva "bila partî eşkerebin yan ji xesbin" dê bikin ev xeletiyek e. Kesêna bawer bikin ku di vê prosesê de partiyêni eşkere pêwistîyeke bila ji bo avakirina van partian kar bikin û gerek mirov hurmeta xebata wan bigre. Lê eger dijitiya partiyêni xef yanî partiyêni ne qanûni bikin ev dibe çewtiyek mezin û wê ew kes di karê xwe de ji bi ser nekevin. Ev herdû bawerî ne dijî hev in. Herweha hev temam dikan.

Bê goman li ser vê babetê gelek minaqeşeyen dirêj têne kîrin. Lê min xwest tenê bala hin terefan di vîwari de bikişinim.

Girtiyêni Kurdêni siyasî, ji ber helwest û kiryarêni dijdemokratik, bang li raya giştî kîrin

Amed - Girtiyêni Kurdêni siyasî yên ku li girtigeha tipa D a Amedê ne, di derbarê kiryarêni ku rûbirû dimînin, nameyêni agahdarkirinê şandin baroya Amedê, komeleya mafêni mirovan, odaya bijîkîn Tirkîye û mazlûm derê. Di nameyan de tê destnîşankirin, ku mercen xerab ên li girtigehê rê li ber

nexwesişyên giran ên fiziki û psikolojik vedikin. Girtiyan ji bo çareseriya pirsgirêkîn li girtigehê bang li rëexistinêni civaki yên sivil kîrin û ji wan xwestin ku serî li serdozgeriya komarê ya Amedê, wezareta dadê û miduriyeta giştî ya girtigehan bidin

Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav:

Navnîşan:

USA, Kanada û Austuralya
6 mehan: 70, €
Salekê: 120, €

Welatêni Yekîtiya Ewropa
6 mehan: 60,00 €
Salekê: 90,00 €

Konto:
V. Efe/Peyama Kurd
IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00
BIC: COBADEFFXXX

Elmanya:
6 mehan: 50,00 €
Salekê: 70,00 €

Commerzbank Bonn
V. Efe/Peyama Kurd
Konto: 1007947
BLZ: 38040007

Ji bo welatêni din têkiliyê bi rojnameyê re deynin.
Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel.: +49 (228) 18 00 654 – 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Komara Demokratik a federal

Nasrettin Akyol

Gelo kesekî ku aligirê aştiyê û azadiyê be dikare di heman demê de weke prensip li dijî Komarek Demokratik -ci li Tirkîye, ci li welatekî din derkevê û nepejirin? Bersiva vê pirsê kin e: mirovekî kû aştiyê û azadiyê bixwaze, wê bi erêni li Komarek Demokratik binêre, ji ber kû ji sistemek wiha tê hêvîkirin ku jibo pêdiviyen civakî bixebe, mafêni hemû besen civakî û kêmnetewa biparêze, bêyî ku cudatîyê bixe navbera wan, lê bi şertê ku ew komar bi rastî demokratik be û ne tenê xwe bi gotina demokratik bixemline. Minakêni wisa hinek dewletêni Afrika mîna Kongo û Etyopya ne, ku xwe weke Komarêni Demokratik didin nasandin, lê pirsgirêkîn wan welatan bi gotinê komar û demokratik mixabin heya iro nehatine çareserkirin.

Eger wisa be, gelo ji ber ci sedeman beşek mezin ji gelê kurd bi erêni li vê projeya kû ji bo Tirkîye tê nîqaşkirin nanêre û bi gûmane? Anji em kurd ne aligirê aşti û azadiyê nê? Bêgûman pêwist nake kû hertim rebeni û xêzaniya gelê kurd û hêvîyen wî ji bo aşti û azadiyê bêne zimên, êdî herkes dizane ku kurd ji herkesi bêtir amade ne ji bo lihevhatinekê.

Çend sedemêni tirs û gûmanen gelek kurdan -ci endamêni rëexistinan, ci ji serbixwe- dikarin bi kinasî wisa bêne binav kîrin; belki sedema heri giring ewe kû gelê kurd xwe di nav wê "Komara Demokratik" ku tê xwestin de nabîne û xwe weke şirîkê wê komarê nahesibîne. Ewyek begûman ji neheqîya dîrokî ku gelê kurd rast hatiya tê û ev hest bi hêsanî nikare bê guhertin. Gelê kurd ji xwe dipirse: belê Komarek Demokratik ji bo tîrkan, lê ci Feyda me jê heyê, kanî bedêla berxwedana bi salan? Kiyê mafêni me bike bin garantîyê, biparêze? Li aliye din kesekî ji gelê kurd pîrsîye ka ci dixwazin, gelo ew otonomyê, federasyonê anji serxwebûnê dixwazin, anji bi halê xwe qayile? Di rastiyê de kesi ji gel ne-pîrsîye ka ew ci dixwazin, lê li ser wan tê ferz kîrin kû ci layiqê wana tê dîtin. Eger gel kariba nêrin û daxwazên xwe bîne zimên, bi iştîmalek mezin piranîya gel piştî tekoşina bi dehsalan belki tenê serxwebûn qebûl bikra. Lê ya giring ewe ka di bin şert û mercen iroj ci mumkune û bersiva heri realist çiye.

Mafêni gelê kurd li gor rewşa iroj heri baş dikare di çarçeveya dewletek federal de bîne parastin û bi wî rengi gelê kurd ji bo demek dirêj bîne qayîl kîrin kû mafêni xwe û rewşa serxwebûnê nexwaze. Ji ber ci dewletek federal û ne di çarçeveya wê sistema ku iro li Tirkîye heyî anji di çarçeveya wê Komara Demokratik ku tê xwestin? Ji ber ku di rastiyê de Komarek Demokratik bixwe ji li Tirkîye tenê dikare bi riya pêşî naskirina mafêni kurdan û bi qebûlkirina pêwistîya çareserkirina pirsa kurd bi awayeki hemdem bê avakirin. Yanî naskirina mafêni kurdan û kêmnete-

wê din di çarçeveya sistemek federal ji bo pêkhatina komarek bi rastî!) demokratik şerte. Ne pêşî Komara Demokratik û paşê mafêni kurdan, lê pêşî qebûlkirina mafêni kurdan û paşê derbasbûna, anji bilêvkirina wê rewşê weke Komara Demokratik. Eger ne wisa be, gelo di kijan astê anji rewşê de mirov dikare bêje êdî Komara Demokratik pêk hatîye? Kijan merc tê dikan ku mirov karibe bîbêje şertîn îlankirina Komara Demokratik pêk hatine û ew tekoşin gihiş armanca xwe? Anji evyek wê dîsa di destê ên desthilatdar debê ku li gor kîf û berjewendiyêni xwe ilan bikin ka Komara Demokratik êdî pêk hatîye an na? Bêgûman piranîya kurdan wê bi rewşek wisa nedîyar û nezelal qayîl nebin.

Di nav sistemek federatîv de mafêni xwebixwerêvebinin ê gelê kurd bi idareyek herêmî û di nav wî mafêni de hemû mafêni din ên civakî ji di destûra bingehin de têne parastin. Idareyên herêmî ji bêtir dikarin xwe li gor pêdiviyen herêman organize bikin û bibin bersiv ji bo pirsgirêkîn rojane ên gel. Sistemek federatîv belovajî nêrinêni ku dibêjin ew rê li ber parçebûna dewletê vedike, di rastiyê de qebûlkirina hukûmeta navendî ji aliyê gel bi xwe re tîne û bingeha wê dewletê xurttir dikê. Ji ber kû sistemâ federatîzmê rê didê pîrrengiyê û idareyên herêmî û gel dikare xwe azad bîne zimên, di navbera gel û dewletê de girêdanek dilxwaz çedibe û gel xwe xwedî û şirîkê wê dewletê dihesibîne, evyek ji aştiya navxweyi û yekparbûna xaka wan dewletan dipareze. İro piranîya dewletêni rojavayî -kû Tirkîye dixwazê bi riya endametiya Yekîtiya Ewrûpa (YE) bikeve nav wanku pirnetewin û welatêni heri pêşketi ne bi sistemêni federatîv têne birêvebirin. Minakêni heri baş Elmanya, Belçika, Avusturya, Kanada, DYE û gelek dewletênin dinin.

Avakirina Komarek Demokratik berîya naskirina mafêni kurdan -evyek ji weke li jor hat destnîşankirin, heri baş dikare di çarçeveya sistemek federatîv de bîne bicihanîn- û herweha qebûlkirina şâsiyêni borî ji aliyê desthilatîfîyê, wê ne mumkun be û ew hewldanen ku vêgavê bi hêvîya naskirina realiteya kurdan di prosesa avakirina komarek demokratik û perspektîva YE, wê nekarin bibin bersivek li gor pêdiviyen gelê kurd ên iroj û wê mixabin mecbûr qels bimînin.

Lê ya giring ji ewe ku navê dewleta Tirkîye Komara Demokratik be anji ci bibe bila bibe, ji daxwazên gelê kurd re tenê sistemek mîna Federasyonê dikare ji bo demek dirêj bibe bersiv. Jixwe piranîya welatêni endamêni Yekîtiya Ewrûpayê û YE bi xwe ji li ser sistemêni federatîv hatine avakirin, û Tirkîye ji ev bi dehsala ye dixwaze bibe endam. Eger Tirkîye dest ji hewldanen endametiya YE berde ji û nexwaze/nikare pîrsa kurd bi rengeki maqûl û nûjen çareser bike, wê gavê tenê rîyek ji kurdan re tê hiştin, ew ji ya tekoşina ji bo serxwebûnê ye.



Elî Qazî:

„Di dîroka Kurdistanê de Komarek bi navê ,Komara Mehabad‘ çênebûye“

“Li gora bîr û baweriya min, pêwîste kurd roja damezirandina Komara Kurdistanê bikin rojekê netewî. Ez vê kêmasyî di Dewleta Kurdi ya başûr de dibînim ku heta niha ew roj nekirine rojekê netewî. Her wiha pêwîste roja şehîdbûna Pêşewa ji bibe roja şehîdên Kurdistanê” Ew yekemîn Komara Kurdistanê bû. Pêwîste mirov ji bo dîroka xwe bi hurmet be

Qazî jî kirene, dipirsin. Ew dibêje ku guhertineke pir mezin di jiyana wan de çênebûye û wiha berdewam dike:

“Guhertina ku di jiyana min de çêbû ew ku ku ez ji bo xwendinê şandim Tebrizê. Dayika min digot ku wê pir bêriya min dikir. Ez kurekî bi

tenê bûm û qet dûrî malbata xwe nemabûm. Dayika min li ser min digiriya. Wê digot ku wê demê Qazî bi destê wê digirt, ew dibir ber camê, zarokên ku ji dibistanan vedigerian nîşanî wê didan û digot: Binere, ev tev kurê me ne, ferqa wan û kurê me tune ye. Çûn û hatina xelkê zêde bûbû, her demê mala me tiji mîvan bû. Li gel me hestên kurdâyî, welatperwerî û xoşevîstiyê li beramberî gel bi hêztir bûn. Em ji her demê zêdetir bi kurdbûna xwe hisiyan”.

Li ser bingeha pirsa me ya di derbarê kar û xebata Mîna Xanim û jinê kurd di nava Komara Kurdistanê de Kek Eli Qazî dibêje:

“Di zemanê Komara Kurdistanê de kurd mîna iro ne pêşverû bûn. Di wê demê de jinê xwenda kembûn. Sê-çar kesen ku cend salan xwendibûn hebûn. Yekemîn dibistana qîzan ji aliye Pêşewa ve hat avakirin. Cend jinê ku xwendina bilind kiribûn, mamosteti dikirin. Cara yekemîn di dîroka Kurdistanê de, wê demê Yekîtiya Jinê Kurdistanê hat damezirandin û diya min Mîna Xanim seroka yekîtiyê bû. Piştre Pêşewa daxuyaniyek da û ragihand ku mafen jin û mîran yek in. Pêwîste ew ji mîna mîran xwediyê hemû mafen bingehin bin. Lê belê hinek melle li diji wî derketin û gotin: Qazî Mihemed bûye kafr, tiştekî wiha di islamê de tune ye, jin nîvê mîran e û nabe ku mîna wan be. Piştre Pêşewa civîneke berfireh li gel melleyan li dar xist û sê rojan gotübêja mijarê kîrin. Li dawiyê piraniya wan pejirandin ku divê mafê jin û mîran yek bin. Ew biryar xistin programa komarê û heger temenê komarê dirêtir bûya ewê têketa destûrê jî.

Li gora ku Kek Eli Qazî dibêje, Komara Kurdistanê deriyê xwe ji bo temamê kurdan vekiriye û xwestiye ku her kurdêk li gora taqeta xwe besdarî kar û xebata komarê bibe, lê belê şert û mercen demê destûra vê yekê nedane. Kek Eli di derbarê wan şert û mercan de wiha dibêje:

“Pêwîste mirov bizanibe ku ew dem ne dema compyûter, telefonê des-

tan û balafiran bû. Çûn û hatin kêm bû û kurd di derbarê rewşa hev de ne aghadar bûn. Pêşewa herdemê behsa karûbarê kurdan yê ji bo serxwebûnê dikir, behsa şoreş û serhildanê kurdan dikir û dida zanîn ku Komara Kurdistanê berhem û berdewamiyeke wan şoreşa ye. Gelek kurd ji başûrê Kurdistanê hatin tevlî karê komarê bûn. Yê herî navdar di nava wan de Melle Mustefayê Berzanî bû. Pêşewa ew vewwend nava komarê û-ew bû serleskerê giştî yê Komara Kurdistan. Lê belê derfet kêm bûn. Wek nimûne, şiferekî kurd tune bû ku bibe şiferekî Pêşewa. Di nava kurdan de kesek nehate dîtin, şiferekî komarê yan Ermenî bûn yan jî Asûrî bûn. Piştre çûn şiferekî kurd li Tehranê dîtin û anîn ji bo ku şiferekî Qazî Mihemed bike. Sinema û radyoya kurdî jî hebûn, lê kesekî nîzanîbû karûbarê wan birêve bibe. Cend malbatên kurdên Sovyetê anîbûn ji bo ku karê sinemê û radyo bikin”.

Di dema Komara Kurdistanê de simbilek û pêñusek li ala Kurdistanê hatibûn zêde kîrin, Kek Eli wateya wan her dû sembolan wiha şirove dike:

“Di dema komarê de du al hebûn. Yek jî ala netewî ya Kurdistanê bû û ya din jî ala Komara Kurdistanê bû. Ala netewî, roja 27 meha dawî ya sala 1945 an li Mehabadê hat bilind kîrin. Rengen wê sor û spî û kesk bû û rojekê zer di nîvê wê de bû. Ala Komara Kurdistanê jî heman reng têde hebûn, lê pêñusek û simbilek lê hatibû zêde kîrin. Pêşewa, girîngiyek mezin dida xwendinê. Ew pêñus dihate wateya pêwîstî û girîngiyâ xwendinê. Ew di wesiyetê xwe de jî dibêje, xwendin ji bo kurdan ji her tişti girîngit e. Pêşewa li ser du xalan pir radiwestiya. Yek ji wan xwendin bû û ya din jî yekîtiya kurdan bû. Simbil jî dihat wateya ku Kurdistan welatekî çandiniyê ye. Ji xeynî zad tiştekî ku mirov derxine derve tune bû. Debara kurdan bi tenê li ser çandiniyê bû”.

Em hêdi hêdi ber bi rojên xemgîn ve diçin û li deriyê girtigeha Mehabadê didin. Pêşewa, li gel birayê xwe û kurapê xwe di girtigehê de ye û yê ku cara pêşin çûye serdana wan Kek Eli ye. Ew bi xemgîni behsa wê serdanê dike:

“Ez li gel efserekî iranî ketim hundir. Bavê min ji bo wî efsere wiha got: “we çîma ev kesen din girtine, tu berpirsyariya wan di vî karî de tune ye, ez berpirsyarê her tişti bûm. Birayê min û pismamê min bi temen ji min biçüktilerin û di nava me kurdan de biçûk rîza mezinan digrin, wan jî daye pey gotina min. Pêwîste hûn wan azad bikin, berpirsyar ez im”. Bîranîna herî xemgîn ya ku di serê Kurê Reş de zindî maye û wê herdemê bimîne jî ev e:

“Bê gûman, bîranîna ku herî zêde ez pê dişsim, roja şehîdkirina bavê min

e. Digotin wê hikûmeta İranê Qazîyanı sirgûnî derveyî Kurdistanê bike. Wisa dihat gotin. Me qet bawer nedikir ku ew werin şeniqandin. Em wê şevê li mala xwe raketibûn. Berê sibehê em bi dengê hewar hewara mirovan hişyar bûn, xelkê Mehabadê hatibûn ber deriyê mala me û dikirin hewar. Ew dîmen ji ber çavên min naçin. Komara Kurdistanê li meydana Çarçira hatibû ilan kîrin û bavê min li gel hevalên wî li wir hatibûn şeniqandin. Wan dixwest ji kurdan re bibejin, “li vir dest pê kir û wê li vir jî biqedê”. Em neçûn Meydana Çarçira, lê piştî ku ew ji bo şûştinê birin Mizgefta Bazarê, min laşê bavê xwe, apê xwe û kurapê bavê xwe dîtin. Karûbar li Mehabadê rawestiya bû xelk tev hatibûn goristanê. şîna wan 6-7 mehan hate gitin. Ji her derê Kurdistanê xelk dihatin serxeşiyê. Diya min bi salan şîn gerand. Ji bîra min naçe, odayeke me hebû berê wê li goristana Mehabadê bû. Her cara ku diya min di pencereya odê re goristan didit, mîna roja yekemîn digiriya. Me pir hewl dida ku diya me neçe wê odaye”.

Em tev li vir xemgîn dibin û naxwazin gotineke din bikin. Gotina dawî disa ji devê Kek Eli Qazî derdikeve û vê bangê li kurdan dike:

“Li gora bîr û baweriya min, pêwîste kurd roja damezirandina Komara Kurdistanê bikin rojekê netewî. Ez vê kêmasyî di Dewleta Kurdi ya başûr de dibînim ku heta niha ew roj nekirine rojekê netewî. Her wiha pêwîste roja şehîdbûna Pêşewa ji bibe roja şehîdên Kurdistanê” Ew yekemîn Komara Kurdistanê bû. Pêwîste mirov ji bo dîroka xwe bi hurmet be.

Wêne: Peyama Kurd





Berdevkê PDK-Bakur Baran Hemze:

„Divê bi qasî hêza dijminên Milletê Kurdistanê yekîtiya me jî bi hêz be“

Ya duyemîn jî, berjewendîya YE di ser berjewendîya netawa Kurd re ye, dema hêzên bakûrê welatê me yekîtiyek kewî pêk bîne bawer dikim YE jî dê hinek din li ser pirsa Kurdistanê bisekine. An jî bi namayênen xweyê dilnerm û nazik dikare piçek dilê hinekan xweş bike. Divê di vî warî de hêzên bakûrê welatê me carek din kumê xwe bîdin ber xwe û li gor vê bîryaran bigrin an jî wê her hale me wisa bimeše.

Bê ku daxwazên we an gelê Kurd li ber çav bigire YE ji bo destpêkirina muzakerreyan tarixek da Tirkîye.

Hûn vê kelwesta YE çawa dinirxinin?

Li Lozanê hinek xêrnxwazan digotin "milêtê Kurd û Tirk branin. Emê di nabeyna xwe de pirsa xwe çareser bikin, daxwazên meyî cida tuneye" irojî hinek xêrnxwaz dibêjin em devletek cuda naxwazin, otonomî naxwazin, fedarasyonê naxwazin. Tenê "komara demokrat dixwazin" divê daxwazên Kurda gelek wekirî û bi dijwarî bê parastin, ev tişt jî bi yekdengiya hêzên democrat, sivil û bi pêswazîya rôexistinên siyasi çêdibe.

Heger miletek xwedî li mafê xwe dernekeve, heqê wî mileti jî tuneye gazindan ji miletek din an jî YE bike. Dema YE dît ku hêzên Kurdistanî bi daxwazên hevbeş gotina xwe yek dikin û daxwazên adil dixwazin, wê demê dê hinek li ser wan daxwazan bi rastî bisekinin. An jî wê gotinêne me tenê di gotinan de bimîne. Ji ber wê yekê emê hinek din hewl bidin ku hemi hêzên bakûrê Kurdistanê tevli vê hevbendiyê bikin.

Di merhela yekem de YE wek ku li Tirkîye pirsek Kurd û Kurdistanî tunebe hereket kir. Li himber vê reaksiyonâ neyêni we ci kir, hûn ci dikin?

Bi raya min hîn ne dereng e, ji ber kû tenê tarixa muzakeran hatîye dayîn ne xêrhatina komara Tirkîye bûye. Lî divê ji her demê zêdetir çalakîyen me zêdetir bibin, bi konsepten konkret derkevin hemberî YE, divê berpîrsen YE baş tê bigêjin ku pirsgirêka Netewa Kurd li bakûrê welatê me çareser nebe, wî çaxî ew pirsgirêken tevayî besdarî nava sînorêna Ewrûpa dibe. Piştî wê demê jî çenabe ku berpîrsen YE destê xwe li çoka xwe bixin. Diplomasîya ku heya iro ji alîyê Kurda ve tê meşandin gelek amator û qels e, divê em rî ji Kurdîn welatperwer re vekin, pirsgirêk an hisabêni piçûk dev jê berdin, derî heta dawîyê ji dilsozêne me re vekin.

Tolhildan tenê li hemberî dijminan

çêdibe, divê em hevûdu hembêz bikin û tehamulê hevûdu bikin. Bi qasî dijminên Milletê Kurdistanê yekîtiya me hebe. Ji bona mejî xetên sor divê hebin, ji bona parastina mafê Kurdistanê divê her pisrgirêka xweyî nawxwê bidine alîkî û li hevkariyê bicivin. Xêncî wê tu tiştek, tu riya me tuneye, em mecburin wî tiştî pêk bînin. Tu regayê meyê cuda jî tuneye!

Hin ne dereng e. Ji bo ku YE di merhaleya duyem de jî guh û çavên xwe ji Kurdan re negirin, hûn ci dîkin an difikirin ci bikin?

Her karê hevbeş ji bona pêşerojê berpîrsyarî digre, bawer dikim em her yek ji alîyê xwede yekîtiyek siyasi dixwazin. Xebata hevbeş herdem derî li pêşîya mîrov vedike, lê durbûn jî mîrov ji hevûdu dixîne. Lî ez bawerim wê karê hevbeş derîyê xebatê heta dawîyê vebike.

Ev hevkariya we dikare we bigihîne yekîtiyek siyasi jî? Gelo ev mijar dikeve rojeva we?

Pirsa weyî dawî herî xweş bû. Di 08.01.2005an de besdarân Beyana Parisê civîna xwe li dar xist. Di wê civîne de carek din bi yekdengî beyana parisê ji alîyê besdarvanan hat pejirandin. Biryar hat stendin; Tekiliya besdarân Beyana Parisê û derveyê xwe bi hêzên Bakûrê Kurdistanê re dê hîn bi quvettir bike, daxwaze me eve ku ji derveyî wan besdarvanan Beyana Parisê ji bikeribin têbixin nav wê hevbendiyê.

Di civîna meyî 8 mehê de gengeşiyek li ser navê xebata hevbendiyê hat kîrin, di encama wan gengeşîyan me navek li wê xebata xwe kir. Ev nav jî Hevbendîya Kurdîn Bakûrê welatê me bû. Ji ber wê yekê jî me ev nav baştırın dît. Lî bi dirêjayî navê me wisa ye. Hevbendîya Demokratîe Kurdîn Bakûrê Kurdistanê ye. Ev nav ne ku di mehna ku enîyek, tenê me xwest kar û xebatê têne kîrin di bin navekî de bê meşandin.

Civîna me destnîşan kir ku wê demê berdevkê Hevbendîya Demokratîe a Kurdîn Bakûrê birêz Musa Kaval bibe. Lî her biryar bi riya komîta karger bê hilgirtin. Çarçova xebata me jî naveroka Beyana Parisê ye!

Ev hevbendî ne navnîşana enîyek e û ne jî li hemberî tu avayîyeke Kurdistanî ye. Ez hevîdarim ev hevbendî di pêşerojê de dê bikare hin karêna baştıriji bo tevgera Kurd bike. Carek din dixwazim destnîşan bikim ku ev yekîti hevbendîyeke demokrat ya hinek hêzên bakûrê Kurdistanê ye.

Heppevîn: Peyama Kurd

Îmzekarê Beyana Parîsê ji bo Raya Giştî Ragihandin

Hevbendîya Demokratîk ya Kurdîn Bakûr civîna xwe 8.01.2005 de li darxist û ev daxuyaniya li jîr belav kir.

Îmzekarê Beyana Parîsê di roja 8ê meha Çileya Paşîn de civînek li dar xistin. Kar û çalakiyê ku di çarçoveya Beyana Parîsê de hatin kîrin û hêj berdewamin, wek xizmeteke baş dinirxînin ji bo doza me li bakûrê Kurdistanê. Partî, rôexistin û kesayetên ku Beyana Parîsê imze kîrine û di civîne de amade bûn, bîryarek yekdengî dan ku van kar û çalakiyê bi yekdengî û bi hevhengî bi bîryar berdewam bikin.

Amadekaran bîryar dan ku ev karê muşterek bi rîk û pêktir û bi sazmendî bidomînin. Ji bo vê yekê, hewl bê dan ku nûneriyek bê vekirin.

Amadekaran civînê bîryar dan ku vê xebata xwe ya muşterek, ji vê û pê de di bin navê Hevbendîya Demokratîk ya Kurdîn Bakûr de bidomînin.

Amadekaran bîryar dan ku vî karê xwe wek nûnerî bi cih bînin. Ji bo vî karî ji Birêz Dr. Musa Kaval destnîşan kîrin.

Amadekarê civînê dixwazin iro karê xwe bêtir li ser diplomasîya prosesa Yekîtiya Ewrûpa xurttir bikin. Daxwazîn gelê Kurd bîghînin rayedarê YE û dewletên endam.

Amadekarê civînê her wîsa qîmeteke mezin didin pirsa yekîtiya neteweyî ya bakûrê Kurdistanê. Yekîti, hevdengî, hevhengîya politîki û rôexistin pêwîsiyek girîng e. Amadekar hewldanen ji bo yekîtiya neteweyî qenc dinirxînin û ji bo her hewldanek pîroz amade ne.

GfbV: Aşûrî-Keldanî direvin Kurdistanê

**gesellschaft
für bedrohte
völker**

Almanya - Civata ji bo gelên li ber windabûnê (GfbV) li ser rewşa Aşûrî-Keldanîyêna Iraqê daxuyaniyeke weşand. Li gor agahdariya GfbV papazê dêra Mûsilî Basilius Georg Wasmusa ku ji alîyê terorîstan ve hatîbû girtin, hat berdan. Lî ji sêkoşeya Erebî koçberkirina Aşûrî-Keldanîyan berdewam e. Heta niha li Iraqê qasî 300 mesîhi hatine kuştin û bi qasî 25 dêr hatine xirakirin.

Serokê GfbV Tilman Zülch dide xuyakirin ku heta niha 11.000 mesîhi çûne Kurdistanê û ew li Kurdistanê ewle ne. Li Kurdistanê ji bo bi cih kirina mesîhiyan komiteyek hatîye damezirandin. Cigirê serokwezîrê Kurdistanê Sargis Aghajan bi xwe mesîhi ye. Hikûmeta Kurdistanê alîkariya pera dide wan û li gorî imkanan ji bo wan xaniyan jî çedike. GfbV ji bo Aşûrî-Keldanîyan serflî 25 dewletên rojava daye ku alîkariya wan bikin.



Nivîskarê Kurd Merwan Osman ket greva birçîbûnê

Siyasetvan û helbestvan Merwan Osman dixwaze bi vê çalakiya protestoyê bala raya giştî ya cihanî bikişine ser çewisandina Kurdan ji aliye rîjima Suriyê ve.

rewa dîkin", û herweha derbarê "sucen kîryar û bûyerên ku di Serhildana adara 2004an de hatine kirin", lêkolin bêne kirin. Siyasetvan Merwan Osman herweha banga serbestberdana hemû girtiyen kurd ên Serhildanê û yên berê û herweha hemû girtiyen raman û boçûnê li Suriyê dike.

Merwan Osman ragihand PYAMA KURD, ku armanca wî ji vê çalakiyê ew e, ku "qerebâixeke baş û mezin çêbiye", da ku Yekîtiya Ewropayê xwe mijûlî pirsgirêkên Kurdan li Kurdistana Suriyê bikin. Wî diyar kir, ku "rîjima Suriyê gi-haye radeyekê ku êdi ditirse." Ji ber vê yekê, ew pêwîstiya xebatên berdewam dibîne, da ku "rîjim bizanibe ku em bê-deng namînin".

Merwan Osman di meha tebaxê ya sala 2004ê de burseya Hannah Arendt a bajarê Hannover wergirt. Ewê bikaribe salekê li vî bajarî bijî û xebata xwe ya wêjeyî pêk bîne.

Hannover (PK) - Endamê Polîtbîroya Partiya Yekîtiya Kurd li Suriyê Merwan Osman, ku weke helbestvan bi navê "Royarê Amedi" hatiye naskirin, ji roja 18ê vê mehê ve li mala xwe li bajarê Hannover ê elmanî ketiye greveke birçîbûnê ya vekiri.

Di daxuyaniyekê de, Osman diyar dike ku bi vê çalakiya xwe dixwaze balê bikişine ser rewşa Kurdan li Kurdistana Suriyê. Ew bangî raya cihanî ya giştî, Yekîtiya Ewropayê, hemû dam û dezgehê navneteweyî, yên mafêni mirovan û demokratîxwaz dike ku derbarê rewşa mafêni gelê kurd li Suriyê û herweha girtina Kurdan, "ji ber ku Kurd in an ji ber ku doza mafêni xwe yên neteweyî yên

Parlemenê Kurdistanê bîryar da ku besdarî hilbijartinê şaredariya Kerkükê bibin.



Peyama Kurd (Hewlêr) - Parlementa Kurdistanê di 15.01.2005 an de, di kombûna hejmar 65 de bîryar girt ku besdarî hilbijartinê şaredariya Kerkükê bibin. Weke tê zanîn berî niha şandeyek ji Kurdistanê bi besdarîya serokê YNK Celal Talebanî û serokê Hikûmeta Kurdistanê Nêçîrvan Berzanî çûbûn Bexdayê û li gel rayedarên bilind yên Iraqê gotübêja bicihanîna xala 58 an kiribûn. şandeyak Kurd bi amadebûna balyozê Welatên Yekîtiya yên Amerika û Brîtanîyayê, bi nivîsin û imzeya tevan ewlekarî ji rayedarên Iraqî wergirtin ku xala 58 an ji zagona bingehîn ya Dewleta Iraqê bê bi cih anîn. Li gora vê zagonê pêwîste ew

Erebênu ku Saddam anîbûn Kerkükê li cihê xwe vejerin û tevayê Kurdên ku ji aliye deshilatiya Saddam ve bi zorê hatibûn koçberkirin careke din li Kerkükê bi cih bibin. Her wiha bîryar hat wergirtin ku tevayê navçeyen ji Kerkükê hatibûn qetandin û avêtibûn ser bajarên din ji careke din lê vejerinin û referandûmek ji bo Kerkükîyan bê sazkarin û nerîna wan bê pîrsin ka ew dixwazin li gel Iraqê bimînin, yan dixwazin tevlî Kurdistanê bibin.


Balyozê Emerika û Brîtanîya soz dan ku di pêşerojeke nêzîk de piştgiriya bicihanîna xala 58 an bikin.

Pirsa Kurdî li Suriyê: Çareseriyeke çawa?

Pirsa Kurdî li Suriyê bi pirsa demoqratiyê ve girêdayî ye

Xalid Sîno*

Kêşa Kurdî li Suriyê kîsha gelekî ye, ku li ser xaka xwe ya dîrokî dijî, hejmara wî zêdeyî 2 melyonan e, bindest e û ji hemî mafêni xwe yên neteweyî û herweha yên mirovatî û demokratî ji bêpar e, rewşa wî jî mîna rewşa civata surî bi tevayî ye.



Weha Pirsa Kurdî li Suriyê dijî û ber bi nebaşiyê ve berdewam e, ji ber serdestiya aqilmendiya şofinî ya nijadperest a îdyolociya Bees û nerîna wê beramberî yên din, yên di warêni siyasi û neteweyî de jê cuda ne. Herweha ew encama windabûneke giştî ye ji têgihiştina demokratî, mafêni mirovan û bingehîn Civata Sîvîl û dezgehîn wê, û nerîneke ewlekarî ji bo çareseriya pirsgirêkên siyasi di welat de.

Bi kurtî, dergehê çareseriya Pirsgirêka Kurdî li Suriyê girêdayî pirsgirêka demokratîye. Divê zagona partîyan a nûjen derkeve, yasyêni awarte rabin, dadgeh serbixwe bin, azadkirina mafêni gelemperi pêk were, rê li ber civakê bi hemî rîçen wê yên siyasi û neteweyî vebe, dezgehîn Civata Sîvîl pêk were û herweha pejirandina gelê Kurd û mafêni wî yên neteweyî û siyasi di desturê de weke duyemîn netewe li ser xaka xwe bête kirin.

Ji bo pejirandina gelê Kurd û mafêni wî di desturê de, divê Tevgera Kurd li ser gelek riyan û bi gelek şeweyan kar bike, di warê neteweyî yê kurdî de bi taybeti û yên niştîmanî yê giştî ji hêleke din ve.

Ji hêla kurdî ve, pêwîst e yekîtiya Tevgera Kurdî li Suriyê pêk bê, bi rengekî hevgirtî, rastî, rîexistîni û siyasi, ne mîna dirûşmeke propagandayê, ku ligel hemî bûyerên niştîmanî, herêmî û cihanî kar

bike, da bikaribe pêkanîna demokratîye li Suriyê û çareseriya Pirsgirêka Kurdî bi hev ve girêbide. Ji bo vê yekê dive karê siyasi yê kurdî dev ji ezeziya partiyeti ya teng berde, ku Pirsa Kurdî tenê bi çavekî partiyeti dibine. Ev yek pirsa gelê kurd û mafêni wî yên siyasi piştguh dike.

Ragihandina dezgeheke rîxistîni û siyasi ya kurdî dibe gava pêsi ji bo yekgirtina partiyen ku di warêni siyasi û fikirî de nêzîki hev in, di partiyekê tenê de, da ku karê siyasi û cemawerî yê kurdî ber bi şeweyekî praktiktir ve bête pêşvebirin, ku rewşa bêdengiyê derbas bike û gelê kurd bi şeweyekî nû dûrî xebata daxuyaniyan û ya internêtî bi rî ve bibe.

Gurkirina çalakiyên protestoyê yên aşityane di hundirê Suriyê de û pêşkêşkirina Pirsa Kurdî li ser hêzên navneteweyî yên xwedî bîryar, di pirwaza zagonê navneteweyî de, dê hêzeke dextê li ser hikumeta Suriyê çêke, ku berê xwe bide çareserkirina Pirsa Kurdî.

Ji hêla niştîmanî ve, ji ber ku Tevgera Kurdî beşek ji Tevgera Niştîmanî ya Giştî di welat de ye û nûnerîtiya gelê kurd li Suriyê dike, divê Tevgera jê re bixebite ku diyalogeke siyasi û demokratî ligel serkidayetiya siyasi û herweha partiyen Eniya Niştîmanî û hêzên demokratî yên erebî li Suriyê veke, bi mercê ku ew demokratîye qebul bikin û nerînen xwe yên nijadperestî û şofinî beramberî gelê kurd û hêzên wî yên siyasi rakin.

* Endamê Komîteya Elmanîya ya Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê (Partî)

Serokê DEHAPê Bakirhan: Çareseriya pirsa Kurdî girîngitir e



Türkiye - Partiya Gel ya Demokratîk (DEHAP), di 12ê mehê de li Anqerê komcivîna xwe ya giştî pêk anî. Serokê partiyê Tûncer Bakirhan, di komcivînê de axiftinek kir. Bakirhan destnîsan kir

ku divê Kurdên Iraqê çarenûsiya xwe bi destê xwe diyar bikin û tu mecalîye nedîn tu kesî ku destdirêjiya destketinê gelê Kurd bikin.

Bakirhan, bal kişand ku ji bo aramî û azadî were Rojhelata Navîn: Divê li Tirkîyê, Iranê, Iraqê û Sûriyê doza gelê Kurd bi awayekî demokratîk û aştî bê çareserkirin.

Bakirhan got ku ji bo pêvajoya Yekîtiya Ewropayê faktora pirsa Kibrîsê girîng dibînîn, lê li gor min ev bes nake, faktora herî girîng wê çareserkirina pirsa Kurdî be.

Bakirhan got: „Divê weşana bi Kurdî serbest be. Divê li gel zimanê Tirkî, zimanê Kurd ji, di dibîstanan de û di zanîngehan de, bi awayekî fermî bê xwendinê.“

Roj neçû ava -1-

Hêvîdar Zana

Dîsa roj neçû ava û stêrk derneketin.

Dixwazin min di nava ronahiya rojê de bifetisinin. Tevayê bedena min li dijî min serî hildaye.

Dil û mêjiyê min eniyên şer vekirine li dijî hev. Lê min dixwest ez vê kîliyê di bin ronahiya stêrkan de dirêjkirî bim.

Çend gulên sor bera li ber serê min bin û derdora min xemilandî bê bi pelên ku li hemberî serihildana bê şikestine û weşiyane. Bera çendek ji wan têkevin nava porê min jî. Min ji kengî ve neşûştiye porê xwe, ez nizanim. şehê min jî bi ber çemê Zapê ket û çû. Lê di bin ronahiya stêrkan de wê tu kes porê min nebîne. Destên min jî, ku berî sê rojan min ew li ser çemê Zapê şüştibûn, wê xwe di bin perdeya şevê de veşîrim. Wê şewqa rojê nede ser çavên min û wê tu kes gemara ku xwêdanê tê de cok vekirine, li ser rûckê min nebîne. Ez naxwazim kesek pê bihise ku şehê min ez terikandime. Tu jî wiha li min temâse neke ji lingan heya serî, ez şerm dikim. Jixwe tu dizanî, berî sê rojan dema ku bi teqîna fişekê re min xwe avêt erdê, neynika min di berîka êlegê min de şikest.

Ax... wê kengî roj biçe ava û stêrk derkevin. Çermê lingên min ji meşê tenik bûye. Dema roj biçe ava, di bin ronahiya stêrkan de ezê lingên xwe hene bikim. Di binê şes cot gore de tenik bûye çermê lingên min. Stêrk derkevin, ezê êşa wan jî ji bîr bikim.

Nizanim çima ez iro gelek dengan dibihîsim. Tu dibêjî belkî tebietê xwe weke orkestrayekê tevgerandiye û êrişike pirdengî tîne ser min. Naxwazin ez aştiyê bibînim di nava bêdengiyê de. Ba, pelên daran, beqîn newala jérîn, çivîkîn xerîb, şalîl û bilbil, hemû tiştîn bi can bûne endamên orkestrayê û her yek dengeki derdixîne. Ji dûr ve dengê helikopterekê jî tê guhê min. Wê niha tebiet jî weke min her tiştî ji bîr bike û guhê xwe ji wî dengî re veke: Çûk bi çûkaniya xwe wênewêrîbe bifire. Wê per û baskên xwe li hev bicivîne û xwe di nava şaxêñ darekê de veşîre. Lê nizane ku xwe teslimî qurbanê yekemîn kiriye. Wî di tevayê hebûna xwe de xwe sipariye daran, ewji xwe re kirine parêzgeh û hêlin, lê êdî li vî diyarî ne parastina



daran, ne ya çivîkan, ne jî ya mirovan maye. Her yek û nesibê xwe. Belê, çîrcirkîn ku bi şev û roj guh ji mirov dîkin, wê piştî vî dengî, li cihekî bigerin ku xwe tê de veşîrin û ji bo kîliyekê be jî, ewê dengê xwe bibirin. Ew dengê ku bi ser hemû dengan ket, hêdî hêdî nêzik dibe û belkî nehêle ku ez derketina stêrkan bibinim...

Dilê min ji her demê bêhtir û bi tevayê hêza xwe lê dide. Ezê jî weke her tiştî bican xwe veşîrim.

Lê ez bawer dikim êdî ne pêwîst e. Dengê nexweş ji me dûr ket.

Ez nema dikarim bimeşim. Lîvîn min zuha bûne, çenteyê li ser pişta min ji bedena min girantir bû ye. Bi tenê nanekî sêlê û kulmek xwê tê de ye, ji xwe şehê min li ber avê çû û neynika min şikest. Bera stêrk derkevin ezê qefla porê xwe jî bidim ber meqesan. Tijî sîpî bûye porê min. Ez şerm dikim bibêjim, lê ez dizanim ku wê di nava min û te de bimîne. Sabûna min tune, av jî hîna geleki dûre û ji xwe şehê min li ber...

Dayika min pê bihese wê xwe bi gîrî bikuje, wê li ser qefla porê min yê weke tariya şevê binuhîrîne û bibêje...

Ez rebena porê henekirî bim lawoo... Ez bi qurbana gûlsora xwe bim lawo... lawoo...

Dayika min geleki ji porê min hez dikir, ew bi sabûna şînokan dişûşt, her sal carekê hene dikir.


Lê ez mecbûrim bidim ber meqesan, çare tune. Piştî jî, ezê tevî ji erdê kom bikim û di binê tehtekê de veşîrim. Ü wî meqesê ku bibe qatîl qefla porê min jî, ezê bişkinim û bavêjim.

Hele bera stêrk derkevin, ezê gelek tiştan bikim..! Ezê agireki mezin vêxînim ji qurmê darên hişk û çaydanek av bidim ser. Çaya reş nîne, bera tune be, ezê çaya Caterê çebikim. Ji dema ku min dest bi meşê kiriye ez Caterê kom dikim. Beriyen selwarê min tijî Cater bûne. Ez bawer nakim te berî niha çaya Caterê vexwaribe, ma wê tu li kuderê vexwî! Çaya Caterê tenê li vê derê tê vexwarin.

Piştî ezê hînek Berû kom bikim û bavêjim ser bizotan. Min êdî darêñ. Berûyên şîrîn baş nas kiriye.

Ez di bin ronahiya stêrkan de jî wan dibînim. Nebêje, ma di vê demê de tu yê berûyan ji kuderê

Li Kurdistanê yekemîn otoban



Cotyar Darfiros (Hewlîr) - Li Kurdistanê yekemîn otobana modern çêdibe. Ev projeya stratejik wê di meha Adarê

de destpêbike. Wê otoban di ber sînorê Tirkiyê û Sûriyê re derbas bibe û xwe bigihîne Hewlîra Paytext. Tê gotin ku wê nêzikî 3 milyar dollar pere lê mesref bibe û wê li tevaya Iraqê di warê xwe de bibe projeya yekemîn.

Li gora ku tê gotin wê otoban li gora standarda herî modern ya dînyayê bê çekirin. Bi vê projeya girîng, herêma Behdînan û Soran bi hev ve têne girêdan.

DMME, Tugaya Komando ya Boluyê mehkum kir

Dadgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpayê Tugaya Komando ya Boluyê Mehkûm kir.



Turkiye - Dodgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpa, di doza kuştina gundiyan de leşkerên Tugaya Komando ya Boluyê mehkûm kîrin. Li gorî agahdariyan, Dewleta Tirk gelekî hewl daye ji bo ku vê bûyerê veşere lê ew bi ser neketiye.


Di sala 1994an de li gundê Fisê (Tirk ji ber politikaya asimilasyonê dêbijin Yolçati) girêdayî navçeya Licê, Kamil Menteşe, Yusuf Bozkuş, Reşit Demirhan û Ebdulwahap Maço ji aliye hêzên ewlekariya dewletê ve hatibûn kuştin. Piştî vê bûyerê malbaten kuştian serî li dodgeha Mafêni Mirovan ya Ewrûpayê dabûn. Di encama lêkolinan de dadgeh gihişt wê baweriyê, ku Turkiye mafê jiyanê û her wiha mafê serlêdanê binpê kiriye. Di biryara bi sedem a Dodgeha Mafêni Mirovan de tê gotin ku hîna jî awayê kuştina her çar gundiyan zelal nebûye, piştî 7 salan li cihê bûyerê lêkolin pêk hatiye û ev 10 salin ku di derbarê vê yekê de tu encam nehatiye

wergirtin. Dodgeha Mafêni Mirovan a Ewrûpayê destnişan dike ku, rayedarên dewletê bi qasî ku tê xwestin lêkolina bûyerê nekirine, berpirsiyariya xwe ya li beramberî jiyanâ mirovan bi cî ne-anîne û dibe ku di vê pêvajoyê de hinek delîl ji holê hatibin rakirin.

Di biryare de tiştî herî balkêş ewe, ku hîna jî lêkolina balistik ya guleyên ku ji laşen gundiyan hatine derxistin, cênebûye. Li gora biryara dodgehê, pêwîste Turkiye 15 hezar Euro pêşkêşî her malbatê bike. Her wiha wê Dewleta Tirk 10 hezar Euro jî mesrefen dodgehê bide. Di 13 ê gulana sala 1994an de leskerên Tugaya Komando ya Boluyê û yên fermândariya Cendermeyan a Licê avêtibûn ser gundê Fise û mirovén bi navê Kamil Menteşe, Yusuf Bozkuş, Reşit Demirhan û Ebdulwahap Maço bi xwe re biribûn. Piştî girtina wan bi 4 rojan, 17ê Gulanê de laşen wan li nêzikî gund hatibûn dîtin.

Li Îranê zextê li ser Kurdan zêdetir dibin

Li gorî agahîyen hatine bidestxistin, rejîma Îranê, li bajarê Mahabatê, bi şêweyekî nû zextê li ser Kurdan dike.



Mahabad - Hat ragihandin ku wezîfedarên dewletê, li nav Mahabatê digerin û navên dikan û cîhîn bi Kurdî hatine nîvîsandin, qedexedîkin û dixwazin, bi navên Farsî bêñ nîvîsandin. Wezîfedarên dewletê, xwedîyê dikan û esnafan tehdît dîkin û dibêjin, eger di nava 10 rojan de, daxwazên wan pêk neynin,


wê li dijî wan dozê vekin.

Li gorî agahîyan, biryara mijara gotinê, biryarek fermeviye û di çapemeniya Îranê de jî cih girtiye. Wekî din, navên Kurdî yên li zarakan tê kirin jî bûne pirsgirêk mezin û gelek navên Kurdî hatine qedexekirin

Niviskar Yusuf Yeşilöz

Mixabin edebiyata Kurdî hîn xwendevanê xwe negirtiye

Min li hepsa Metrîse (Stanbul) sê rojan birinê xortekî hefdeh salî ku bi êşkence bûyîn bi "Arko Kremi" melhem kirin. Li hepsa Enqere ez bi kesen wek Îsmaîl Besçikçî yan ji Parlamente DEPe re mam. Gelek însanek ku hatibûn êşkence kirin li vir bûn. We dîti-ne resim anîn ber çavê min û min nikarîbû bi nivise wan bînim zimên. Ji bo wê min qirara film dabû. Film baş hate girtin, li weletê Ewrûpa gelek rexne li ser hatin nivîsin. Heta niha televizyonê wek ZDF, 3sat, SF1, SF2 ew nişan dan.



Di sala 1964 an li gunde Xalika (Konja) Navenda Anatoli hata rû dine. Di sala 1987 an de hat Swissre û hin li vir e. Çend salan kitabxane û weşanxanekê wî bi navê Ararat hebû, ew bi xwe nêzî-kî deh berhemên niviskarên Kurd wer-gerandinê zimanê Elmanî û bixwe çap kiriye. Heta niha pênc kitêbên wî çap bûne, çar ji van romanin (novel), di weşanxana Swissre bi navê „Rotpunkt-verlag“ hatina der, yek ji wan rojana wî ê li hepsê ye, li Elmanye (Unrast Verlag, Münster) çap bûye. Taqrîben sê sala wî di rojnama Swissre de bi navê „Tages Anzeiger“ maqale nivîsin

Peyama Kurd: *Te kengî dest bi nivîsandinê kir? Tu bi kijan zimanân dinivisi?*

Yusuf Yeşilöz: Min di salên 1993-1994 de dest bi nivîsandinê kir. Min kitêbên xwe bi zimanê Elmanî nivîsine, hin ji wan heta niha wergerî zimanên wek Fransî, Italianî, Swedi, Ispanyoli û Tirkî bûne. Di kovara „Bîrnebûn“ de ez kurteçirokan bi Kurdî dinivisim.

Tistê ku te ji bo nivîsandine motîve dike ci ye?


Bersiva vê pirsa hindik zor e. Lê çavkaniya berhemên min berî giştî jiyanâ Kurdan û koçberiyê, însanetî û daxwazên wê ne. Ez bawerim, eger ku ez li gundê bavê xwe bimama û nehatima derveyî welêt, ez nedibûm niviskar.

Tu mijarê nivîsandinê çawa hildibijeri?

Jiyan û problemên rojana der bi pêş dikevin. Têşîra hesretê heye. Biyanî bûn gelek mijarê nû peyde dike. Dürketina ji welêt û hesreta insanên dilsoz jî min motîve dikan.

Rola nivîskariyê di pêşveçûna civatê û azadkirina civatê de ci ye? Bi taybetî di tevgerên rizgarîya netewî de dikare ci rolê bilize?

Di netewbûnê de hafizeya kolektif pir girîng e. Rola nivîskaran di pê-



kanîna hafizeya kolektif de ci ye?

Rola nivîskariyê di pêşveçûna civatê de pir muhim e. Ji aliyekî ji danûstandina tecrûbeya bi civatê re ye. Ji aliyê din jî, bi taybetî berhemên nivîski dibin behra civatê û herdem dibin neynik. Bi dîtîna min edebiyat/literatur pira (kopri) bûyer û dozê ye.

Tu cawa dinivisi, haliyet û ruhiyeya te çawaye gava tu dinivisi?

Nivîsandin wek tiştekî "intime". Merî nikare ji nivîsandinê re plan yan jî bernameyek xwe çêke. Ez zê-detir sibehê zû dikarim binivîsim. Bawerim sibehê hin bala meriv belav nebûye.

Te yek film çêkiriye, ci te motive kir ku tu ví filmî çekî? Tu cawa hatî ser fikra filmçêkirinê?

Ez di sala 1996 an de li Tirkîye ji bo çapkirina pirtûka bi navê "Destpêka Edebiyata Kurdî" hatim girtin. Min li hepsa Metrîse (Stanbul) sê rojan birinê xortekî hefdeh salî ku hatibû êşkencekirin, bi "Arko Kremi" melhem kirin. Li hepsa Enqere ez bi kesen wek Îsmaîl Besçikçî yan ji Parlamente DEPe re mam. Gelek însanek ku hatibûn êşkencekirin li wir bûn. Wê dîtinê resim anîn ber çavê min û min nikarîbû bi nivîsê wan bînim zimên. Ji bo wê min qirara film dabû. Film baş hate girtin, li welatê Ewrûpa gelek rexne li ser hatin nivîsin. Heta niha televizyonê wek ZDF, 3sat, SF1, SF2 ew nişan dan.

Hin nivîskarên Kurd idîa dikan ku tenê kesen ku bi Kurdî dinivîsin nivîskarên Kurd in. Tu li ser vê dikarî ci bijî?

Ew gengeşıya bi taybetî di salên

90î de di rojanê de bû. Eger pirs li ser „etnisite“ be, ew şexs nivîskarên Kurd in. Ji bo sedemên cûrbecûr bi zimanên din dinivîsin. Ez bi xwe bi Almanî dinivîsim, behsa gundê xwe û jiyanâ xwe li Swissre jî dikim. Lê ez Kurd im. Ez pir dilşame ku kesê mîna Yaşar Kemal û Selim Berakat Kurd in. Lê ez nikarim ji berhemê wan re bibêjim ku edebiyata Kurdî ye, ji bo ku ziman rîya edebiyatê ye, ew ji hev nayen vejetandin.

Tu rewsa edebiyata Kurdî niha çawa dibini?

Wêjeya Kurdî (bi taybetî a nivîski) wan salên dawî pir pêşve çû. Hin hene dibêjin, ew "Rônesansa Kurdî" ye. Wexta ku min li sala 1992an de Pirtuxana Ararat li Swissre damezirand, min bi tenê 21 kitêbên bi Kurdî anîn cem hev. Di kitêbxana min a şexsî de iro bi sedan kitêbên bi Kurdî hene. Iro gelek navê nivîskarên Kurd ku têbîbihîstîn hene. Lê mixabim edebiyata Kurdî hin xwendevanê xwe negirtiye. Ez ji dilda xweşbinim ku ew merhelê ji nêzik e. şertê wê sifteh: Pêwîste ku Kurd bi Kurdî biaxfîn û bixwînin.

Kijan nivîskaran li ser te bandor kiriye?

Wexta ku em xort bûn, em „mecbur“ bûn ku nivîskarên wek Gorki, Jack London, Dostoyevski bixwînin. Ez niha bi Kurdî, Tirkî, piranî bi Almanî û bi Inglîzî literatur dixwînim. Bawesînek fireh heye. Îmkan jî hene ku meriv bixwîne. Nivîskarê ku li ser min pir tesîr kirine Yaşar Kemal û Necip Mahfuz'ê.

Hevpeyvin: Seyîdxan Kurîj



Bajarê Şamê, cîhê zaroktiya min -2-

Hêvî Sebrî

Carekê bavê min dest bi qurkeke zi manê kurdî kir. Xortêni ciwan ci wexti wan bixwesta dihatine mala me. Telefonu tu kesî di wan deman tune bû, tenê telefonên hin dewlemendan hebûn. Em ne zengin bûn. Lî belê em bi dil dewlemend bûn, gelek dewlemend bûn. Zanava (kesname) me ya kurdî hebû û em gelek serbilind bûn ku em kurd in. Bavê min kesekî destvekîrî û comerd bû. Ci jê dihat ji bo me dikir. Me zarakan ji dersên kurdî diditin. Ez di sinifa pêncan de bûm dema ez kurdî fêr dibûm. Hînbûna bi tîpêñ latîni hinekî bi zehmet bû. Lî belê kîfâ min û birayê min yê piçûk bi hînbûna zimanê kurdî re pir dihat. Baş tê bîra min dema ku bavo hewl dida ku ji bo em peyvîn kurdî rast bi lêv bikin. Dema wî ruyê xwe diguhirand, ez û birayê xwe bi veşartî di derbarê hin peyv û ifadeyêni ku nêzîkî hev in û wek kafsiye bi hev têni, dikenîyan. Kîfâ me ji hin navê kurdî re ji dihat. Pişti salen 1980yî gelek keçen kurd yên ciwan dihatine mala me ji bo zimanê kurdî fêr bibin.

Bavê min dema xort bû û li Kurdistana Tirkîye dima bi dotmameke xwe re zewicî. Navê wî Eyşê bû. Ji wê zarokek çê bû, navê wî danîn Welat. Bavê min pişti ku hate girtin derbasî Kurdistana Suriye bû. Eyşê ji gelek naxwê bû. Pişti demeke wê vefat kir. Me gelek ji Welat hez dikir, ew nîv-birayê min bû. Paşê ew derbasî Kurdistana Tirkîye bû. Li wir ew ji aliyê leskerên tirk de hate kuştin.

Bavê min di sala 1944an de bi keçeye çerkeze ve zewicî, navê wê şadiye Recep Doghoz bû. Ew ji bajarê Qunaytura bû. Çerkeze milletekî ji Bakûra Qafqasyê ne û li vê deverê belav bûne. Di nîvê sedsala 18 ew bi darê zorê ji welatê xwe hatine sîrgûn kîrin û piraniya wan li Imperatoriya Osmanî ciwar bûne. Diya min keseke xwingerm bû. Bavê min dil dikir ku bi keçeye kurd re bizewice. Ka kiderê bû ew? Herkesi besa qelend dikir, qelend dixwestin. Lî belê diya min wek ji-neke kurd wusan kurdan hez dikir. Wê rojê ez li Swêdê rastî çerkezekî hatim. Ew ji Suriye hatibû Swêdê ji bo ku di derbarê rewşa kurdêni Suriye de seminerekî bide. Navê wî Aslan Kerîm bû. Ew çerkezekî pêşin bu ku ez li Swêdê rastî wî dihatim. Wî ji min pîrsî: Tu zanî paşnava diya te Dogboz tê ci maneyê? Min go na! Wî got ku Dogboz di zimanê çerkezi de ji bo "gurê boz" tê bi kar anîn.

Di sala 1986an de diya min û di sala 1993an de ji bavê min vefat kir. Birayêni min Hoşeng û Hoşin çûbûn Almanyê, Swêdê, birayê min yê din Heval ew ji li Amerikayê ciwar bû. Xwîşka min Hungur ji bi mîrê xwe ve çûbû Swêdê. Pişti ku dê û bavêni min wefat kîribûn, di mala me de Kewê tenê mabû. Çirok û serpêhatiya Kewê gelek dirêj e. Bi jan û êşan ve tiji ye. Kewê dotmama min bû. Navê bavê wê şewket bû. Ew nîv-pizmamê bavê min dihate hesibin û bi jineke bi navê Imxan re dizewice. şewket gelek nexwê bû. Berî ku Kewê bê dinê, ew dimire. Meta min ew bi xwe anî Suriye. Paşê ew li bal me mezin bû. Diya wê bi yekî din re mîr kir. Ji vê zewacê çar kur û keçek çebûn. Dema Kewê mezin bû, bavê min xwest ku bi diya wê re têkiliyan dayne ku carina dê û keç hev bibînin. Sal derbas dibûn. Ev yeka ji bo wê êş û kedereke mezin bû. Kewê ji evîna diya xwe bêpar mabû. Lî belê Kewê cara pêşin di sala 1986an de diya xwe dît.

Paşê salê du caran wê dikaribû di eyd û cejan de derbasî aliye Tirkîye bibe û diya xwe bibîne. Pişti ku bavê min çû rehmetê, wê mîzê kir ku tenêbûn gelek zehmet e, di sala 1993an de bi Mihemed Birimce ve mîr kir. Ew niha li şamê di mala bavê min dimîne. Ez dema diçime şamê, dibime mîvanê Kewê, ez wê wek xwîşkeke xwe wusan nêzîk dibînim. Berî ku bavê min vefat bike, wê gelekî li bavê min dinêri. Diya min berî bavê min miribû. Kewê ji bavê min bibû "dayikekê".


Di sala 1974an de ez û Mihemed Bekir bi hevra zewicîn, me jîyana xwe kir yek. Wî gelek karêni baş li Suriye didîtin, lî belê ji ber ku di warê politik de aktif bû, polêsan ew bi rehet nedîhişin û wî gelek caran karê xwe diguhirand. Paşê wî bîryar da ku here dervayî welat. Xwîşk û birayekî min li Swêdê bûn. Xwîşka min wêneyê xweşik yê Swêdê ji me re dişand, lî belê kîfâ min ji koçberiyê re qet nedîhat. Min xwendina xwe ya bilind, zimanê îngilizî pişti çar salan teze xelas kîribû. Bavê min ji ne daxwast ez û mîrê xwe herin Ewrûpayê.

Bayê min û Mihemed Bekir ji berê de hevras dikirin. Dema di sala 1960î de bavê min hate girtin, di nav wan kesen ciwan de ku bavê min ziyaret dikirin Mihemed Bekir Axa ji hebû. Ew nozdeh salî bû. Wî helbesten bavê min dixwend û kîfâ wî gelekî ji van helbestan re dihat. Paşê ew bû hevaleki bavê min yê nêzîk. Dema bavê min çû Lubnanî, bi Mihemed Bekir li wir di malekê de man. Hevaltiya wan li wir pêşda çû û bi hevra hin karêni politik kîrin. Mihemed Bekir paşê ji bo xwendina bilind çû Çekoslovakayê. Li wir bi xwendekarêni kurd yên mayin ve pêwendî danî û ji bo doza kurdan kar kîrin. Bi bavê min re hertim têkiliyê wî hebûn. Wî li wir mihendisî xelas kîr û di sala 1973an de vegeeria welat.

Di sala 1978an de em hatin Swêdê. Pişti se mehan me li bajarê Uppsalayê dest bi hînbûna zimanê swêdî kir û destûra li Swêdê mayin û li wir karkirinê ji wê demê hate qebûlkirinê. Min li Stockholmê kar dît. Bi zarokêni kurd û erek re dest bi kar kîr. Me paşê mala xwe bar kire taxa Stockholmê ya bi navê Rinkeby. Çend salan min kar kîr û di Universiteya Stockholmê de dewamî hin qursan kîr. Di sala 1982an de min dest pê kir beşa Mamostetiya Berî-dibistanê xwand û pişti çend salan ev beş qedand. Heta niha ji ez wek mamostetiya berî-dibistanê kar dikim. Mîre min li Swêdê beşa komputeriyê xwand. Pişti xwendina xwe wî wek programçekirê komputerî di şirketa Ericssonê de kar kîr. Em ji welatê xwe bi dûr ketibûn, lî belê disa ji em bi hevra dilşa bûn. Di sala 1994 an de mîrê min çû rehmetê. Di jîyana min de qonaxeke teze li xeribiyê dest pê kir. Ew mirovekî dilşa, dilgerm û bi rehm bû. Ji bo jinan hurmeteke wî ya mezin hebû. Ew bi giyan (rih) yekî aristokrat bû. Mirov nikare wî bi çend gotinan bide nasin.

Min wusan bawer dikir ku ez ji der paytextê Suriye, şamê nikarim tu cihekî mayin bijim, min wusan bi dil û can li vî bajari hez dikir. Lî belê her tişt wek mirov dixwaze, nabe. Ew bû nêzîk 26 salan ez li paytextê Swêdê, Stockholmê dimînim. Du welat, du paytext, du jîyan. Koçberî, nefibûn û xeribî bûye perçekî jîyana me kurdan. Heta mîrinê ji mirov bi hesret û bi bêrkirina welatê xwe dijî. Em derketine ger û seyranekê, hertim di rî de ne, sefer dikin. Bi rastî em li erdê xwe, welatê xwe û li koka xwe digerin.

Demokrasî û Kurdistan – bi hevûdu ve girêdayî ne



Cemal Batun

jî bû... Mixabin, pirsa gelê me, pirsa neteweyê me ji... yek ji yêne sereke û herî tevlihev û vê pêvajoya de bû. Sistema sosyalist hevalbendiya Suriye û Iraqê carnan ya Turkiye û Iranê ji bi ser doza rewa ya neteweyê Kurd ve dît. Sistema sosyalist bi xwe ideoloji û baweriya ku pê dayî rî-piştgiriya gelên bindest, di çarçoweya pirsa Kurd de xiste bin piyan. Zêdetir gel û doza me bindestir kir...

Sistema rojava, yan ji ya capitalist, ku xwe bi navê demokrasiyê diguhezîne û binav dike... hemû nirxên demokrasiyê xiste bin piyan de û bû piştgirek xurt ku heta iro ji pirsa Kurdistanê ewqas di rastiyek tevlihev de ye.

Niha, cihana me ji konjuktur/rastiyek din ve derbas dibe, bêguman ev yek ji tesirek berfereh li pirsa Kurd û Kurdistanê dike. Her roja diçe, zêdetir tê xuyakirin/ditîn ku çareseriya pirsan di xeta demokratik de ji tevayiya mirovayetiye re serkeftinek e. Lî, bêguman ev naçe xweşîya parêzeren xet û şopa kevneperek û fanatik. Ew dixwazin, dinya wekî berê birêve biçe.. Lî rastiyek heye, ew ji: her dem- xwedî dinamik û têkoşerî xwe ye, yên ku wê hebûnê biser dixin û diparêzin. Kurd iro parêzvanê demokrasiya cihanê ne-ji bo demokrasiya global Kurd bedelan didin. Vê yekê dinyaya rojava ji dibîne û Kurdan û Kurdistanê wekî partnerek xwe/hevkarek xwe li qeleme dixe. Dixwaze pirsa Kurd bikeve rîya çareseriye demokratik de. Hêzen kevneperek û herêma Rojhila Navîn: Ereb/Turkiye û Iran li pêşya vê yekê dirawestin. Na! Ev yek dê biser nekeve.... Cihan ber bi guherandinê ve diçe.. Guherandinek dibe ku bi eş be ji-lê guherandinek demokratik. Kurd di rîzân pêş û vê guherandinê de ne û rolek berbiçav dilizîn. Bi taybeti ji li Başûre Kurdistanê....

Heta ku cihan ber bi demokrasiyek berferehtir biçe, Kurdistan ji ewqas zêdetir ber bi çareseriya pirsa xwe ve diçe....

cbatun@yahoo.se

STAR

GASTRONOMIE HANDEL
Tevi 300 celeb male xwe di xizmeta we deye!

DÖNER PRODUKTION
LEBENSMITTEL
VERPACKUNG
GETRÄNKE
GERÄTE

MÂHNAZ DÖNER
PUTEN DÖNER
MIX (PUTEN/PUTEN)
KALB DÖNERKETI

ANKÜLMARKTPREIS
Ouflagezeit: 08:30 - 18:00 Uhr

Pizza Käse-Gouda (54,8)	3,09
Thunfisch-Döner (2,65 gr.) LA PERLA	4,49
Pasta Feta Rot (20kg - Netto 14 kg)	39,99
Essig (10lt - 16,5)	4,99
Satz (100kg - Elmer)	5,50
Mayo Hamkar (10kg - Elmer)	11,29
Ketchup Hamkar (10kg - Elmer)	11,49
Pommes (10 kg Kartoffel 4,5 kg)	6,99
Schinken (kg. Preis)	1,89
Puteauschinken (kg. Preis)	4,49
Salam (kg. Preis)	4,19
Pizza Box: 20x20x3:	0,071
Pizza Box: 24x24x3:	0,083
Pizza Box: 28x28x3:	0,10
Pizza Box: 26x26x4,5:	0,10
Pizza Box: 28x28x4,5:	0,111
Hamburger Box:	0,07
Wurstbox:	0,10
Alufolie (1500x30 cm):	4,75

Not: Yen ku male xwe bi xwe
Biven di 1% erzani heye!

FIRMA STAR KALITE YE!
FIRMA STAR ERZANIYE!
FIRMA STAR QASI TELEFONIKE MEZI WE YE!

Adresse: Wiedrichslecker Str. 110
33653 Bielefeld
Tel.: 0521 / 5227366-77
Fax: 0521 / 5227346
Mobil: 0179785905

Jinekolog, mèrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

Fatê Were Civatê



Şêxbat

Bismillahirrahmanirrahim! Fatê Xanim, emrê min 75 e. Ez miridê mala şêx Eli me, xulamê şêxê xwe me. Sê jinêş şêxê min hene. 16-17-18 salî ne. Ji ber 70 horiyên wê dînyayê ez nezewici me, lê bi serê te ez hemâ-hemâ xwe digrim haaa! Wê rojê sofiyekî hevalê min Peyama Kurd xistibû nav şerwalê xwe û bi dizî pêş min kir. Yaho hûn ci tiştik-miştikê xweşik derdixin, di elîf-bêyêne me de tiştên wisa ninin allahwekil! şêxê me em bi peyamê girtin, peyam ji destê me derxist, cù pişta perdê û piştî keliyekê disa hat cem me û got: "Ev kerxaneciya Fatê kî ye? Qetla wê helal e û heçê ji iro û pê de vê defterâ kafiran bixwine ciyê wî cehmemeye." Rojekê ez hatim min nerî şêxê me bi dizî di pişta perdê de li sûretê te dinere û simbêlê xwe badide. Eman-eman bila haya te ji te hebe!

Sofi Xelef / Tilehfer

Lao Sofiko, peppûko, şêx we dixapîne lao! We pîr û kal dike, berê we dide wê dînyayê lê ew qızêni 16-17 salî dixe paşa xwe peppûknî! Binerin min mala xwe xirakir hûn xiranekin. Min jî digot ezê herim wê dînyayê ji xwe re 70 mîri bikim, lê ez polî-poşman bûm û di vê kozika reş de pîr û kal bûm. İcar aqlê xwe bidin serê xwe, fen û fûtekê li serê şêx bigerînin û hersê jinêñ wî li xwe mehr bikin. Yan na bi xwedê hûn jî vê dînyayê jî bibin û ji axretê jî! Lao ma di vî zemanî de qızêni 16-17 salî bi destê kê dikevin Sofi Xelef? Ev gepen xweş, ev sêvîn xelatî, heta ehmeqen wek we hebin ma şêx dev ji vê dînyayê berdide bavêmino! Te go li sûretê min dineri û simbêlê xwe badida? De biner; ji şêxê xwe re bêjin "Fatê 13-14 salîye, horiya buhuşte ye" bi serê te wê şêx dev ji hersê jinêñ xwe berde û bi dû Fata 13-14 salî keve. Hûnê jî jinêñ wî li xwe mehr kin, ma ne qenc e?

*** ***

Tu Fatê Xanimî, jehr û ziqañmî tu çiyî em nizanîn lê em dibhîzin tu gellekî dev tavêjî dewleta me û serokê me haa! Biner gellekên mina te ev bêbextî kirin, dev avêtin me, taliya talî me nema debar kir û me bi vîrûsa kemalî ekran li ber wan reş kir. Te dît bê me ci anî serê Nasnamê, Rizgarî û Newrozcomê ne! Ew jî têr nekir icar me destê Dilbixwinê AvestaKurd ji kelepce kir û emaila wî girt. İcar haya te ji te hebe, gava xwe zêde ramede, yan na emê çavêñ te derxin û desten te ji kelepce bikin haa!

Kemal virusoglu / Anitqebir/Ankara

Errrekkk lao ev ji ku derket! Kemal virusoglu, keko barooo! Brakê Kemo, tu zanî bê Mihemed şêxo ci dibêje ne? "Silavêñ te gihiştin min, li ser ser û herdû çavan, ew mektûba go te şandî lê min xwendibû bi herdû lêva." Lao ma virusa te ji virus bû malxirab! Madem te virus şand, te yek Alamanî bişanda go ekranêñ hemû Kurdan reş bîba gidi! Bi xêra virusa te hema xwediyêñ malperan gotin "eman werin em hêza xwe bikin yek!" İcar vê carê go te virusêk şand, ji kerema xwe yekê atomî bişine go aqlê Kurda bê serê wan, belki bi xêra virusêñ te em mala xwe xirabikin û bibin yek qurban! Lê bela xwe ji Dilbixwin vekin ez li ser wî qebûl nakim haa! De ji gora xwe ranebe û rehma xwedê ne li te be, amîn!

fate@peyama-kurd.com

Pêkenok

Pûke

Bavê Ronahî

Rojkê du hevalêñ welatevîn li çayanekê rûdinin, ji aliyekî ji xwere sohbetê dîkin ji aliyê din caya xwe fir dîkin. Sohbeta wan dizivire tê ser messela Oli. Ji herdûwan yek di baweriya Oli de hinekî sist bûye! Yê din ji baweriya xwe zêde qahîm e. Yê Olqahîm ji yê Olsist re dîbê: Binêr brako, divê mirov xwe ji xwedayê xwe neke, divê mirov hinekî ji li dinya din bifikire. Li dinya din bihuşt û cehenem heye, cehenem! Yê Olsist, dîbê: Hema bila bihuşt ji te ra be. Yê Olqahîm dîbê: Ma tu naxwazî heri bihuştê? Na ez

naxwazim! Tu çire naxwazî? Yê Olsist dîbê: Li bihuştê wê Mihemed bê divê ez rabim pîya, wê Ebabekir bê divê ez rabim pîya, wê Omer bê divê ez rabim pîya, wê Eli û Osman her wusa, Ewlîya û Embîya, Şêx û Mişayîx bê. Ezê qet rehetiyê nebiñim, rehet rûnenim. Min li vê dinê qet rehetî nedî, qe nebe ez, li wê dînyayê rehetiyê bibiñim. Le-wre ez dixwazim bicim cehnemê û rehetiya xwe binêrim. Li dojehê kesek wusa nayêtê, yê bêñ hemî gunehkar in, heke çend şêx, Mela û Sofikêñ wek te bêñ ji, kesek pûkê pê nade. (Hisabê wî nake-qimetê nadê)

Remîldan

Beran (21.03-20.04)



Hûn serê xwe pir bi rewşa aboriya xwe dêşinîn. Wê hinek nûçe we ji vê serêşandinê xilas bikin

Mêzên (23.09-22.10)

Hûnê rojekê xweş bibûrîniñ. Ji bo tiştên piçûk moralê xwe xira nekin, dest li parêñ xwe bigrin

Dûpişk (23.10-21.11)



Dibe hûn pêrgî hinek hevalen kevn bêñ. Hûnê ji aciziyê bi dûrkevin û di serê xwe de zelal bin

Kevan (22.11-21.12)



Hûn dixwazin derkevin seyanê, lê hinek bûyer rê li ber we digrin. Zorê li xwe nekin, riheb bin

Kovî (22.12-19.01)



Her tiştî navêjin nava xwe, ramanê xwe vekiri bêjin. Rê li ber we ye, lê hûn di erênatê de ne

Satil (20.01-18.02)



Ditînêñ xwe vekiri ji hezkiriyê/ya xwe re bêjin. Hûn hewldarin ku aboriya xwe baştir bikin

Simbil (23.08-22.09)



Nûçeyen bi heyecan hene. Pêşniyazi û daxwaz pir in, lê zû biryar nedin û zêde xwe neşinîn.



Masi (19.02-20.03)

Rojek bi heyecan e. Zêde nekevin bin berpirsiyariyê, yan na hûnê tenduristiya xwe serûbin bikin

Xaçerêz

SEREJER

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1			K			A				
2			O	.		C				
3						V				
4										
5			P							
6		I								
7			R							
8										
9										
10										
11										
12										

CEPERAST

1. Dadmendi, heq, maf / lampeyên bedew 2. Hêwi, têhî, care / hestiyek lingan 3. Kurtenivisa "mala Remezanê aso" / jina navsere, ixtiyar, kai / roja em tê de (pasûpê) 4. Du tipen gotina "abit" / sen û tut, derew, xapandin 5. Tîrsonek, newerek / cardin, wek herê 6. İcar, vega (pasûpê) / bi zimanê biyani "amin" / bazdan, devjêberdan (pasûpê) 7. Hophopî, kariyerizm, pozbilindi / kesê ji Amede ye / 8. Xak, zemîn, war (pasûpê) / kurtenivisa "tekoşna tevgera Kurd" / lehiya berfê, herka berfê 9. Komela mafê mirovan a dînyayê / abori, maddi, pareyi / navê darekê, jina ji mîr berdayî 10. Nabe, pêknayê / bas, qenc, rind.

Bersivêñ hejmara 19an

Ceperast

- 1) Tahir tosq 2) Emare / rabe 3) Mam / kaos 4) Eziq / sk / pe 5) No / est / cer 6) Niştîmanî 7) Nermayı 8) Nicma / üdra 9) Ica / nida 10) Kas / ol / nér 11) Ar / ekol / dé 12) Merd / nayij

Serejér

- 1) Temen / enikam 2) Amazon / icare 3) Hamî / incas 4) Ir / qesem / ed 5) Rek / stranok 6) Astim / ilon 7) Orok / Mañd / la 8) Fas / çaydan 9) Ib / penir / edî 10) Qemerî / avrêj

Zelal

Jeyan av e, e!
av Zelal e!

Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.: 0221 376 24 05

Bayiyêñ Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96
LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH (MANN-HEIM)
Tel.: 0621 318 76 70
TRINK-ZEL II (DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150
CAN GETRÄNKE (ESSEN)

Tel.: 0201 289 74 17-18
TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23
HARRAN GmbH (FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64
CHAPLIN GETRÄNKE (BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR (ER-FURT)
Tel.: 0361 26 27 516
TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11
NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

مهر حهبا هونه رمهند

رمههه

ماوهیه که فهزایه کی نازار له
روژنامه کانه وه بگره تا رادیو و **TV**
ی ئورزى و ناسمانی بىز دهنگ بىز
و چاوهش و گورانى بىز و تەقىدېبىز
رەخساوه هەر ھەوشىيان له ئىز ناوى
ھونرمەند پىتاسەدەكىت لەلایەن
ئەو مىدىيائىنوه وەک وا لە ھونەر
گەيشتبىن ھەرچى «ئەمان» و ئۇفيكى
لىنهات، پۇيىستە زاراوهى ھونرمەندى
پىتۈدلىكى، ئەوهى روودەدات بە راستى
تەنبا لەلای مىدىا كوردىيەكان، كاكى
خۆم خوشكى نازىز ئەي ئۇفانەى
ئە جۆزە چاپىكە و تانە سازىدەدەن،
مافى ھونرمەندان پىشىل مەكەن
چونكە ئەم زاراوهى ناوى خۆي بە
خۆيە، واتە ئەوهى لەم بوارددا
كار دەكت بەلای كەم دەبىت ئەلف
و بىي موزىك بىرانى، بىزنى «سۈول
قىچى» لە موزىك چىيە كام لەو لەشكەر
گۈرانييىزە يان تەقىدېبىزانه دەتوانى
رسەتىيەك گۈرانييەكانىان بە «صۈول
قىچى» بلىنەوە، خۇ ئەگەر لاسايى
عەربىيىش بىكىنەوە بە حۆكمى
تىزىكىمان لە عەربە، عەربەب ھىشتىا
بە ئىنسافىرن، چونكە دەلىن «مەربى»
يا مەغنى يەكىسىر نالىن «فتان» ئىممەس
بەھەرمەندمان ھەيە و دەنگىبىزمان
ھەيە، ھونرمەند نازنانو يكى زۇر
مەزىنە با رىزى ليتكىرىن چونكە ئەم
وشەيە لە ئاكامى كارى ئەكادىمىي
و تىكىيەشتن درووست دەبى، خۆزى
بپوانامەمهىي كى بالا يە.



گویرده ناوەردۆکی بابه‌تەکان
بە مەبەستى چەشىنگ
پاراستن . و وەرپەھىتانتى
دەولەمەندى ئەددىبى كوردى،
بە زمانىتىكى رەسەن و پاراۋ،
وتارەتكانى هىتاواھتە بەرىباس
و شىكىردنەوه، بە چەشىنى كە
بە پېنۇيىستى زانىيە لە پاشكۈزى
كىتىپ فەرھەنگىكى بۆ تەرخان
كىتاب

هه رووهها بز گشت با بهته کان،
سهره تا پیشه کنی کورتی
بز نووسیوه تا زینی
خویه هر ئاماده بکا بز راھی
دەقی سه رکه کی. له دوايدا
خویندن و هدی ئەم کتیبه به
گشت هۆگرانی ئەدەبی کوردى
پیشئیار دەکەم و ئاواتى
سەركە وتن بز نووسەرە
ئېلەم و چاوه روانى بە رەھە مى
تر ئام بە رېزىدە.
ناسر با باخانى

توده‌ری پیووندیه کانی ئابوری، کومه‌لایه‌تی و فرهنگی کورستان، کوه‌توونه بهر راقه وهله‌نگان، به ایاتیه‌کی تر بیروزه‌نی خوینه په‌لکیش کا باز وردبوونه‌وه له گشت لایه‌نکانی سفر به ژیانی کومه‌لگای کورد. نووسه‌ر ههندی و تاره‌کانی کتیب به پالشتنی پیویزی هانس گئورک کادامیز، یانی و توبویزی ئاسوکان، به کره‌سه و امرازی توپخوازی، له دلاقه‌ی ئوربی دروانیته هله‌لویستی کاراکتیره کان و هش و همای سردهم دهخاته به راقه شکردنوه به مهستی نرخاندینان به پیوهری ئوربی. نووسه‌ری هیزا درور به شاره‌زاییه، دهور و هله‌لویستی ههندی له قاره‌هانانی ناو به‌یتکانی گری اووه به ئەردبی دوله‌مندی هه ندران و بیه‌ریکی رانوان، به چهشنى که خوینه ره شانازیبیه و خۆی له دهشتی هه راوى دهدبی فولکلوری جیهانیدا دهینیته‌وه خاللیکی کرینگ که پیویسته له به‌رچاو گیری، زمانی کتیبه‌کاهیه. نووسه‌ر به


ناساند نی کتب

له سه هر تای پاییزی نه مسال. کتیبی
ژیله مون که رامان و وردیوونه و هیمه که له
بنه ماکانی نه ده بی فولکلوری کوردى له
۲۰۵ لایه پهدا به قله می پیزدار عزیز
وه لیانی، له لایه بنکه فرهنگی هیوا
پلاو کرایه و بوبو به شه و چله بیک بو
هزگرانی که لتووری نه ته و هی.

له سی سالی را بیدوودا به شیکی به رچاو
له نوسخه نه ده بی زاره کی له لایه
دلسوزانی فولکلور تعیا کو کراوه ته و
له قوتان خلیسیون. به لام نه وه راستی
بی تا نیستا ج توییزنه و هیک له سه ر
بهند و به یه کان له کوردستانی نیزان
نه کراوه، هله بت به رجی دوو به یتی
مه و زین و سه یه دوان، هر وه ک کاک
عزیز له په راویزی ژیله موندا ناماژه هی
بینک درووه. کعوا بوبو کتیبی نیوبراو و دک
یه کهم به ره همی لینکلینیه و ناساندی
پله و بایه خی نه ده بی فولکلوری کوردى
دینه ئژمار.

نووسه ر له توییزنه و هی زور بی
باشه تکان پشتی به ستوروه به
تا بیه تمدنیه کانی میژووی کومه لا یتی.
هر بیم پی و دانه ش دابونه ریتی کومه ل
و هله لویستی که ساتیه کان له سه ر

وَاٰتَىٰ سَهْفَرْ دَهْ گُورپِیٰت! A380



شیراک گوتی: ئەم کارهەتان سەرکە و تىيىكى مەزىنە بىز ئۇوروپا، بىلەرىش گوتى؛ ئەم فرۆكە نوپىيە واتاي سەھەر دەگۈزىت، ھەرچەند ئەم فرۆكە نوپىيە A380 ھېيشتا نەفرييە بەلام يەكم كاروانى ئەزمۇونى لە مانگى ئازارى سالىي داهاتوودا دەبىت، تا ئىيىستا زىياتر لە ۱۳ كۆمپانىدا اوڭاكارى خۇيان بىز كېرىنى ۱۴۹ فرۆكە پېشىكەش كەرددووه، كە نىرخى يەك فرۆكە لەم جۈزە لە نىتىوان ۲۲۳ تا ۲۸۶ مiliون دۇلارە، لەم فرۆكە نوپىيەدا ژوررى نۇوستۇن و ھۆلى وەرزىش و ھۆلى پىشوازى تىتىدai، ئەم فرۆكە يە زىياتر لە ۸۰۰ نەھەر ھەلدەگىرى.

رژی سیشه‌مه کومپانیا ئىریبايى ئەوروبى بىز دروستكىدىنى فرىشكە، پەردەي لە سەر جۈزىكى نۇيى فرىشكە يېكى مەزن لادا، كە بە A380 ناونزا، لە شارى تۈلۈزى فەرەنسا بە ئامادەبۇونى چوار لە سەرانى دەولەتلىنى ئەوروبا و سەرۆكى چواردە كومپانيا، ئەم فرىشكە يەكى مەزندى و بە ئامادەبۇونى سەرۆكى فەرەنسى جاڭ شىراك و سەرۆك و ھەزىرى بەريتانيا تۆنلى بلېر و راوىيەتكارى ئەلمانى شرۆددەر و سەرۆك و ھەزىرى ئىسپانى ساپاتيرۇ نىشاندرا. حۆكمەتكانى چوار ولايەتى ناوبرار لە بەرەھەمەنتان، ئەم فرىشكە بەدا بەشدارىن كە ۱۰ مiliard يۈزۈنى تىچۈوه، لە ئاھەنگەكەدا

په یامی کورد ئاماھەی
بلاوکردنەوهى ریکلامەی
بازرگانی و بروسکەی
پیروزبایی و پرسەنامەیه
بەنر خیتکی گونجاو

عیراقیه ک که سایه تیله کی به ناو بانگی شاری میونشن ده گوزنیت



موده و دهوله مهندی ناسراوی
ئه و شاره "موسسه مهندی
رودزلف" به دستی
عیار آقیه ک خنکتیدنرا.
موسسه مهندی که
کاری کوشتنی
هموو ميديا کانی
ئه لمانیای هه راند،
سه رباری ئه و هی
که هون رمه ند
دهوله مهندی که و

کاتزمنیر ۱۱ عیراقیه ک به ناوی هیرش
سواری نو تومیله که دهکات و به ره و
مالی خوزی دهیات و پاشان له دوای
نه نجامداني کاری سینکس لی نیوانیاندا
له سه ر بربی ئو پاره یه که له سه ری
رینکه و تبوبون مشت و مز ده که ویته
نیوانیان و سرهئه نجام هیرش به
هزی وا یه رینکی کاره با ئو که سایه تیه
ده خنکیتت. تا انبار له دوای نه نجامداني
کاره که دهسته جن هه دلیت، به لام
پاشان له رینگه DNA و پولیس ئو
تا انباره دهستیشان و دهستگیری
دهکات.



میونشن - پهیامی کورد - روزی
۲۰۰۵/۱/۱۴ لهشاری میونشن
که سایه‌تی ناوداری جهانی داهنگانی

ئازانسى تورىيىستى

NEW PLAN

ئىمە ئامادە خەزىمەت كىرىدىن ماۋالاتىپىانى كوردى عىيەرلەرنىن

كۈردەستان لە رېڭىز ئارانەوە

قىيىزاي ئىتاران لە ماۋەدى دوو ھەفتەدا

لەگەل ھەر بىلەتكى دووسەرەتى ئاران، مەدۋايدى خوارەدن لە شىكتىرىن
رېستوران لە ئاران بە مۆزىكى زىندۇو

خەلات

كەشتى تورىيىستى 53111 Bonn Thomas-Mann Str, 24
بىلەتكى سەرتاسلىرى جىهان Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E-Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

بىلەتكى سەرتاسلىرى جىهان

ھاجىز
عەرمى

Linguicide û linguistic suicide

S. Unus & Berivan-
Isabella Unus

Yên kitêb şewitandise û ziman ve-
mirandine ti xêr nedîtine. Yen dix-
wazin zimanekî bikujin, kok û reha wî
biqelînin, wê rojek dûr an nêzîk ti xêrê
nebînin.

Bila 400 milyon xiristiyanen di Yeki-
tiya Ewrûpa de ji 70 milyon mislimanan
(tirk, kurd) netirsin!

Bila 300 milyon tirkê li Tirkîyê, Tur-
menistan, Ozbekistan, Kazaxistan û
Azerbeycanê ji ji çend
miliyon kurdan qet netirsin.

(...)

*Gulê baxê İremê Botan im
şebçiraxê şebê Kurdistan im
Çi tebiet beşer û insan im
Laîlahilhemd, ci alî şan im
(...)*

*Nonendê derî, lisanê kurdî
Înaye nizam û intizamê
Keşaye ceşa ji boyî amê
Da xelkê nebêjin ko Ekrad
Bê merifetin, bê ,esl û binyad*

(...)

*So der Westen wie der Osten
Geben Reines dir zu kosten.
Laß die Grillen, laß die Schale,
Setze dich zum großen Mahle;
Mögest auch im Vorübergehn
Diese Schüssel nicht verschmähn.*

*Wer sich selbs und andre kennt,
Wird auch hier erkennen;
Orient und Okzident
Sind nicht mehr zu trennen.*

(...)

**Mella Ehmedê Xanî, 1650 Hekarî/
Kurdistan**
J. W. V. Goethe 28. August 1749 Frankfurt am Main/Deutschland

Piştî avakirina Cimhûriyeta Tirkîyê, ji
bo vemirandina zimanê kurdî hertiş
hate kîrin ko zimanê kurdî vemirinîn,
da ko hewcetiya axaftina vî zimanî diha
nemîne. Pêşiyê linguicide û pasê ji
banning (vemirandin û berbendkirina
zimê) hate kîrin.

Serokên tirk dixwaztin bi darê zorê yek
netewe, yek ziman û milleteki xwerû yî
tirk biafrînin. Ew kêm û zêde gîhiştine
armaanca xwe. Ajotina armanca mille-
teki üniter û üniform ji heftê salî zêde-
tirin e li Tirkîyê tête tetbiq kîrin. Di vê
kîrinê de ti pejmûrdeti û kêşmekêsiya
orientali tine. Bi tese û dirûva discipline-
ke rojavayî ev kar hatiye kîrin. Ev rastiy-
eke ko meriv nikare wek mirîyan li ber
çavê xwe bigre.

Mehmet Emin Bozarslan hê di salêni
1960î de Alfabe'yeke kurdî ji bona zaro-
kan derxistibû ko ev „elîf-bâ“ hate ber-
bendkirin. „A b c“ hate criminize kîrin.
Mîsalen wiha bi hezarân hene. Tu dikarî
li ser feonomenen wiha romanian bin-
visî; şanoyan û filman çêbiki. Seminer
û sempozyoma bidarbixînî.... Ev realita
heye. Jixwe ji vê realité re di zaniyariya



sosyoloji de linguicide tête gotin.

Lê realiteke din ji heye ko kurd qet wek
mesela namûs û şerefê li ser vê meseleyê
naxafin. Meriv eskere dibine ko gelek
kurdêni li Tirkîyê naxwazin zimanê xwe
yê sirin bi dilxwesi bikarbînin. Di axaftina
rojane de, di komal û dezgehêni kur-
dan de, li Ewrûpa ji zimanê wan bi tirkî
ye. Ez ji vê realité re linguistic suicide
dibêjim, da ko ev tişt wek meriv bi destê
xwe zimanê xwe biküje.

Bersîva ko hin kurd dibêjîn „em zimanê
xwe naçeyîvin, da ko tirkan zimanê me
berbend kiriye“ bersîvek zehf basit û
ne dirüst e. Ji vê gotinê bîhneke gemar
tê. Da ko tişten qedexe zêdetir merivan
rêkûpêktir, xîrettir û hêrs dîkin. Li gor
vê teoriye dîvê kurdan zêdetir zimanê
xwe hez bikira.

Herçend ev kuştina zimanen li gelek
ciyên cihanê hebin ji taybetiyek li ba
kurdêni Tirkîyê heye ko laiqî lêkolîn û
lêgerînê ye. Ev lêkolîn, lêgerîn ne tenê
pirseke polîtik; herwiha pirseke so-
syo-psikolojik e. Keç û xorten kurdan,
evindarén zimanê kurdî dîvê bi vê pîrsê
re zehf serê xwe bişînin. Ko serê wan
bi zimanê dayikê eşîya, bila tirkî li wan
hezar carî bimbarek be !

2. Linguicide û linguistic suicide?

Nazîyen alman ên nemirov genocid'ek
li dijî cuhudan bi disiplîna germanan
anîn pêk. Tu ko bixwazi tov an reha
bakteriumêkê biqelîni dibe baktericid.
Ev virus be dibe virucid an myko-
se (karî, mantar) be, dibe mykocid an
fungicid. Sadam Huseyîn genocid bi
jehra biyolojik li bajarê Helebce bi kar
anî. Termînolojiya „lunguicide ter-
minolojiyek ne nû be ji gelek mirov vê
terminlojiyê nîzanîn. Zaniyarekî kurd,
li Toronto/Canada ye, bi tespit dibêje
ko li Tirkîyê li dijî zimanê kurdî luin-
gicide hatiye pêkanîn. Gelek zaniyaren
cihanê vê terminoljiyê ji bona „kok- an
tov-vebirrrîna“ zimanekî bi kar tînin. Di
Tirkîyê de li dijî zimanê kurdî linguisci-
de hatiye kîrin, tê kîrin û wê hê ji bête
kîrin. Piştî linguicide ji xwe hewcetiya
bikaranîna vî zimanî namîne ev ziman
tê berterefkirin an nehîstîn; angô ber-
bendkirin. Englîzi ji vê diyariyê re „ban-

ning“ dibêjîn.

3. Banning of the language (berbend- kirin an bêfeydekirina zimê)

Hewcetiya peyîvîna vî zimanî namîne.
Hingê çawa ko merivekî depresiyoneke
(xemsari) wî ya xedâr a bêderman hebe,
hingê li xwekustinê difikire ango „su-
icide“ di laş û giyanê vî beşeri de pey-
da dibe. Rewşa zimanê kurdî li Tirkîyê
hema bi vî avayî ye. Ew ti hewce an feyda
di axaftina zimanê xwe yê sirin de, di zi-
manê bavûkalên xwe de, di mîras û kela-
pora hezaran salan de, yanê di zimanê
kurdî de wek merivekî bi nexweşîya
Alzheimer lê rabûbe, nabîniñ. Wek tu-
neleke bêronahî dixwazin tişte mayî ji
vemirinîn û jîbir bikin. Da ko ev zimanê
békêr, bêfeyde û derdeser bi tenê lûk-
sek e. Lewre ev ziman di mekteban de
nê xwendin. Békêr e, bêfeyde ye. Tistik
bêfeyde be, diviya ye ko tu jê xelaz bî.
Wek kincekî kevn i diha bêfeyde be an
xurekeki bêçej bêtehm be, meriv dixwa-
ze bi lez jê xelaz, rizgar û azad be. Ko
meriv vî zimanî bikuje, merivê jê xelaz
û azad bibe, lewra di vî zimanê békêr de
diha ti kar, feyde, menfe'et û qirt tine. Bi
tenê luxeke bi problem e. Heger meriv
ev tişte békêr kuşt, meriv ji binbaryê
xelaz û rizgar dibe. Ev ji kuştina zimanê
xwe bi destê xwe ye. Herçend di psikolo-
jiya xwekuştinê de pêvajoyeke wisa hebe
ji di zaniyariya sosyoloji de tiştek wisa
tine ye. Ez ji vê fonomenê re linguistic
suicide dibêjim. An ji vekuştina zimanê
xwe bi destê xwe.

4- Fêrbûna zimanê zik-makî camêrî ye, esl û esalet û hêvî ye; gerdenazadî ye; Ev berxwedana dijî xinzîri, zikreşî û xwexapandina xwe bi xwe ye.

Herçend li dijî gelek zimanen cihanê
ev kirîyara hatiye kîrin ji, hebûn û mayî-
na kurdan li Tirkîyê bi zimanê kurdî
ve girêdayî ye. Kurdêni bakûr ji bona
azadiya destxistina zimanê xwe berx-
wedaneke xedâr û bêeman dane. Ko
ew resistanz nehate kîrin, dibe ko iro
li Amed'ê daxwazên demokratik qet
nebûye mijar. Hetanî niha fêrbûna zi-
manê kurdî di qursen pirîvat de ji ne

serbest bibuya. Di roja iroyin de ev tişt
destpêkeke rind be ji ticar têra vejiyan-
dina zimanekî berbendbûyî û mirî nake.
Divê kurdî di dibistan û destgehê fermî
de bête qebûl kîrin. Kurdêni kurmancia-
xêf nikarin bi kurdêni zaza re bipeyivin.
Derfet û xwasteka ko em fêri zazakî an
ew fêri kurmanci bibin di me de tine.
Ji xwe gelek kurdêni elewî ji zimanê
kurdî nefret dîkin û tirkî ji bona wan
bêminaqese çêtir e. Pêşiyê ziman kuştin,
paşê ji bi destê çepen tirkmanc kurd ha-
tin bêiman kîrin. De kerem bike: Wan
dixwast ko herin Çin û Maçin'ê, da ko
mîlyaran proletarya Çinê rizgar bikin;
paşê, piştî rizgarbûna proletarya cihanê
wê kurd serbest bibûna! De kerem bike
kenê qijika li vî mîjîyî tê. Bibe dijminê
millettê Ewrûpî û Amerîki, da ko dîn û
zimanê wan heye. Kurd di nav du agiran
de mabûn.

Jixwe ziman û dînê milletekî nemîne,
diha ci wî heye?

Diya wî û bavê wî kurd in; lê ew bi xwe
ne kurd e? Ez dibêjim nêr e; ew dibêje
de bidoş! Mîriv nikare gayekî bidoş!

5-Gotineke Almanan

(Wer aufgibt, gewinnt nie; wer nicht
aufgibt, gewinnt.)


Yê ko dev jê berda, ticar sernakeve;
yê ko devjêbernedâ, dikare serbiceve.
Xwezilka me mislimanan bêl alikariya
Yekitiya Ewrûpa bi hev re yekîtiyeke
brati saz bikira. Qibla me yek e. Lê, va
ye ko em em nikarin. Ji mentalita eşireti
rêna de ko bêjeyen wek „tevayî, bihevre“
ummetekê mîna ya Yekitiya Ewrûpa'yê
bê xire-cir û şer saz bikin. Binhîrin ko
ew in ko bêşer yekîtiyeke ji 25 welatan
saz dîkin. Di me de ev merîfet û keramet
tine? Ewê ko dibêjîn ev listika emper-
yalistan an xiristiyanan e ji ji rastiyê der
e. Tikes kurê bavê me nîn e.

Herçend qibla me mekke be ji em jehrê
didin birayê xwe û naxwazin zimanê
wan ê hezarân salan di mekteban de bê
hîn kîrin. Lê em kurd serbilind in ko me
ji bona azadiya xwe berxwe daye. Bila
ew şerm bikin. Jiber ko me kurdan ticarî
ji wan re bêbextî nekîr.

Riya me kurdan û tirkan ne heyvero,
ne ji tarî û şevareş e. Riya Yekitiya
Ewrûpa'yê di Amed'ê re derbaz dibe. Ev
riya, riya demokratizebûna Tirkîyê ye.
Riya zanyariyê, mafêni mirovati û ya jin
û zarokan ji ev rî ye. Riya me riya xwe-
bawerî û azîm û sebrê û m'erifetê û hev-
girtinê ye. Ya iqnakirina Tirkîyê ye. Jix-
we ev dikare bibe serbilindiya Tirkîyê.
Em naxwazin mîrasê me yê hezar salan
wek cendekekî mirar li erdê bimîne. Ev
cendekekî zimanê me ye. Ji bona vî cendekekî
hezarân û sed hezarân keç û xorten me
xwe qurban kîrin. Emê rojekê dereng
an zû vî cendekekî dîsan bi azîm û sebir; bi
hevgirtin û xwebawerî vejîn.

Azadiya kurdan serbilindiya van mille-
tan û ya Tirkîyê ye, da ko çand, rabûn,
rûnistan, xwarin û vexwarina me wek
hev e. M'erifet û keramet di fehmikiran,
rêzgirtin, hevgirtina hev û din de ye.
Jixwe Tirkîyê ji vî tisi naxwaze?

Mîrê dengbêjên Kurd: Karapêtê Xaço Ji nav me barkir



Min klamên xwe tev bi Kurdi stra.
Ji xeynî Kurdi min bi tu zimanê din
klam negotin. Min qet bi Ermenikî
stran negotin. Ez Kurd im û hemû
stranên xwe bi Kurdi dibêjim. Min
qet ji bo pera stran negotin. Ji bo
pera stran gotin tişteki pir şerm e, di
dengbêjiyê de ji bo pera stran nayê
gotin. Ez Karim bê rawestan me-
hekê bi şev û roj stranan bêjim

PK - Dengbêjê navdar Karapêtê Xaço, di 103 saliya xwe de xatir ji jiyanê xwest û li nêzîkî paytexta Ermenistanê Erîwanê, li gundê Vaskohat, hat veşartin. Bi qasî hezar kesi tevlî merasima veşartinê bûn û dengbêjê navdar rîwî kirin. Tevî ku ew bi eslê xwe Ermenî bû jî, lê wî wek hunermendekî Kurd mohra xwe li dîroka çand û hunera Kurdistanê xist.“


Dengbêj Karapêtê Xaço, nêzîkî 90 salan stranên Kurdi stra û li li hemû parçeyên Kurdistanê li pey xwe bi dehan kaset hişt. Xaço, di warê edebiyata Kurdan a devkî de xwedî tecrûbe û zanînek kûr bû. Xaço, ku bi qasî sedsalekê li sîrgûnê, bi talan û mirinê re rû bi rû ma, salên xwe yên destpêkê wilo tîne zîmên: ‘Batman, wê demê bi Amedê ve girêdayî bû. Ez-jî li wir ji dayîk bûme. Pişti ku min sala 1915an di ferma Ermendiyan de dê û bavê xwe wenda kirin, di salên xwe yên zarokiyê de ketim ser rîyan.“

Xaço paşê diçe Qamişlo û li wir tevaya 15 salan ji bo artêsa Fransî leşkeriyê dike. Paşê, Xaço li Ermenistanê jî bi hezar zehmetiyan re rûbirû dimine û bi qasî 50 salan li radyoya Erîwanê dixebe.

Karapêtê Xaço, di van salên dawî de pîrsîrêkên xwe yên tenduristiyyê pir gi-

Xerîta fezayê

Astrofizikaran mezintirîn xerîta fezayê derxistin û ji bo pîvana fezayê beşek nû afirandin. Wê du komên navnetewî vê projeyê bimeşînin



Daniel Eisensteinê ku ji zanîngeha Arîzonayê di komekê de cih distîne dibêje “ heta niha me xerîta zêdeyi 260 hezar galaksiyan derxistiye“. Li gor bawermendiya kozmolojik a gelempêri, alema îroyîn berî bi 14 milyar salî di encama “teqîna mezin“

de afirî ye. Li gor Eisenstein alem bi pêlên enerjiyê ve dagirtiye û ev pêl şopên teqîna mezin a berî bi 14 milyar sal in. Astrofizikciyê zanîngeha Portsmouth a Îngîliz Bob Nichol jî got ku “ ev pêl bi teqîna mezin re afirîne û piştî milyonek sal cemidî ne.

Ev pêlên ku em di vê xerîta iro de dibînin, şopên piştî teqîna mezin bi milyaran sal in“. Herweha zanyar û pisporê Amerîkî, Îngîliz û Avûstrali destnîşan kirin ku her serê 500 milyon salên şewqê galaksiyek diafiye. Salên şewqê, di valayıyê de rîwîtiya şewqa salekî ye. Ev ji té maneya 9,461 milyar kilometre. Herweha pisporan anîn zîmên ku piştî “teqîna mezin“ feza pir bi lez berfireh bûye û beşê mezin ê alemê ji “maddeya reş“ a esrarengîz an jî ji enerjiyê pêkhatiye.

Cara êkê... Peyve Çend peyvîn hevdij

Seîdê Dêreşî

E ve cara syêye em li bin vî navî gotara xo dinivîsin, dîsan jî em berdewamîn li ser vê mijarê, hîvia me ewe xûndevanamifa jê wergirtibit. Evê carê dê çend peyvîn hevdij, ji gotinê: „bilind û nizim“ yan „ser û bin“ yan „jêhel û jorda“ û hevalên wan, di vê nivîsinêda berçav keyn.

Mixabin ku gelek nivîsanen me bo van peyvîn xwarê bahra pêtir „jér û jor“ bikartînin, ku bikaranîna wan bi vî rengî keçe û ne diruste. Pêdvîye mirov bizanît ka her peyvek li kîj cihi tête bikarinan. Ezmanê kurdi gelekê zengîne, bo her tiştekî, yan her dyarokekê peyva xo heye, eger nivîsevan wê peyvî nezanît û peyveka dî ji wateya wê dwîr binivîsit, dê ezmanê wî lawaz bit û nivîsin jî dê ya leng bit.

Evê xwarê jî ew çend peyvin:

Bilind + Nizim: bo Bilind; dê bêjî: ((xanyê Tmoy yê Bilinde, Û xanyê Avdelî yê Nizme)), ((Esman yê Bilinde, Erd yê Nizme))

Silal + Xwarê: dê bêjî: ((dê çime Silal, dê hême Xwarê)). Xanyekê çend qat, bo serî dibêjin „Silal“ bo binî dibêjin „Xwarê“.

Serkeftin + xwarkeftin: ((Serkeftime serî çiyay, Xwarkeftime binê çayay))

Serkeftin + Dakeftin: ((herdu siwar li girê şivana Serkeftin, herdu siwar Dakeftin deşta Xanemîra)).

Serav + Binav: ((Serava Gundî, Bina-va Gundî))

Ser + Bin: ((Serê Darê, Binê darê)).

